


**A**merîkayê rapora xwe ya der barhe mafên mirovan a sala 1996'an weşand. di vê raporê de li ser gelek îhlalên mafên mirovan ên li Tirkiyeyê tê sekinîn û tê daxuyakirin ku rewşa mafên mirovan li Tirkiyeyê ji par ne baştir e. Her wiha di raporê de tê gotin ku qetlîama Basayê hêzên dewletê kiriye.

Li gorî raporê hêzên dewletê bi texmîni 2400 gund û mezra vala kirine. Her wiha tê gotin ku her çiqas piştî 1991'ê materyalên bi kurdî zêde bûbin jî, divê hemû dan û standinên siyasî bi tirkî çêbe. Dîsa hemû materyalên li ser çand û ziman û dîroka kurdî bi hinceta cuda-kariyê têne berhevkin.



**Rewşenbîrê ereb HADÎ EL ELEWÎ ji bo rojnameya me bi JAN DOST re peyivî û wiha got: "Her dinya li hev dikeve, mezlûm nêzî armancên xwe dibin"** Rûpel 8-9

**Xwediya rojnameya me CELAETTİN YÖYLER li ser şewitandin xaniyê xwe ji aliyê leşkeran ve ku serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê dabû nivîsî** Rûpel 5

**DILBIXWÎN DARA bi sernavê "Ji ber min ve silav li zarokên Licê" li ser zarokên welatê rojê ku durûşam Berxwedan Jiyano ji xwe re kirine rêber rawestiya** Rûpel 13

NAVEROK



Ferenc Çobanoğlu: Rewşenbîrekî têkoşer İsmail Beşikçi

4



Memed Memedî: Her du rûyên aştiyê

6



Düzgün Deniz: Bayê Elegezê

7

# Ji Xwendevanan

A NIHA li Tirkîyeyê bi navê Azadiya Welat rojnameyê kurdî derdikeve, beriya wê, Welatê Me derdiket, ew jî xwerû kurdî bû, lê mixabin ji aliyê dewleta xwînwar ve hate girtin. Ku mirov xwenas û welatparêz be, mirov Azadiya Welat û civakê di ser a ferdî re digire, lewre pêşketin bi ferdî nabe, bi civakî dibê. Pêwîst e ku mirov bi hev re di nava yekîtiyê de ji bo welat û azadiya xwe xebat û têkoşinê bike.

Rojnameya kurdî cara yekemîn di sala 1898'an de bi navê "Kurdistan" derket. Ji wê rojê bi vir de gelek hoqebazî û asteng li serê rojnamevanîya kurdî çêbûn û hê jî berdewam e. Daxwaziya min ji gelê me ew e ku, li rojnameya kurdî xwedî derkevin û bi kurdî bixwinin, bi kurdî bifikirin, bi kurdî binivîstin û bi kurdî biaxivin.

CABBAR GÜNEŞ/ ALMANYA

EZ her tim nizanim çawa roja yeksemê tinim. Ji ber ku roja yeksemê roja kirin û xwendina Azadiya Welat e. Berî ve bi salekê min dest bi xwendina rojnameyê kiriyê. Ez rojnameyê tev dixwinim. Gazinc û rexneyên we ji me xwendevanên pîrek re hene. Ji aliyekî ve rast e. Xwendevanên pîrek ne pir in û tîkiliyan bi rojnameyê re danayin. Lê, ji aliyekî din ve nameyên me jî nayên weşandin. Sedema vê yekê çi ye? Ez nizanim. Lê, gerek bê zanîn ku xwendevanên rojnameyê pîrek in jî, mezin û biçûk in jî. Heger nexwînin jî guhdar dikin.

Welatê me ji aliyê çand û hunerê ve pir dewlemend e. Hin berhemên edebiyata devkî hene. Her berhem di wextekî de û bi rengêkî tê nivîsandin. Divê, orjînal bin û taybetiyên van berheman bîn parastin.

BESTEVİN/ MÉRĐİN



# Werin bazara îtîrafkaran

SAMİ TAN

**D**i kapîtalîzmê de bazara her tiştî heye. Her tişt dikare ji xwe re bazarekê peyda bike. Piştî bûyera Susurlukê îcar bazara îtîrafkaran derket holê. Çi kesê ku sûc kiribe, li ser kanalên televîzyonê digere, heke li gorî dilê wî pere bidinê dest bi îtîrafên xwe dike. Zimanê bazirganî ango îtîrafkaran jî li gorî cihê ku ew lê ne diguhere. Hin caran dibin netewekar û rastgir, hin caran dibin sosyal demokrat, heke pêwîst bibînin jî dibin şoreşger. Pirî caran sedema îtîrafan jî cuda tê zimên.

Bo nimûne îtîrafkar Murat İpek di bernameya Objektif ya Show TV'yê sedema îtîrafên xwe wisa dida xuyakirin: "Soz dan me, gotin 'emê we bîkin polis', lê niha li me xwedî dernakevin'. Ev sedem belkî sedema herî nêzî rastiye bû. Lê eynî kesî di rojnameya Radikalê de got: "Em dixwazin wekî mirov bijîn, em ji bo jiyaneke asayî ji PKK'ê reviyên, lê bi me sûc dane kirin...", İpek li ba rojnameva-

nên ji Demokrasiyê îcar bûye 'welatparêz' û dibêje: "Me li dijî gelê xwe sûc kir, em ji neteweya xwe lêborînê dixwazin."

Digel vê rewşê jî îtîrafên îtîrafkaran girîng in. Lewre ew digel sûcên xwe, yê dewletê jî eşkere dikin. Heftaya çûyî îtîrafkarên ku ji PKK'ê reviyên, dest bi îtîrafên xwe kirin. Du îtîrafkarên bi navê Murat İpek û Murat Demir di rojnameya Radikalê de û dîsa Murat İpek di rojnameya Demokrasiyê de li ser kirinên kontrayan agahiyên balkêş dan. Ji kuştina Mehmet Sincar bigire, heta kuştina Apê Mûsa gelek sûcên xwe yê dewletê eşkere kirin.

Li gorî gotina Murat İpek wî Bişeng Anik bi emra Ünal Erkan kuştîye. Dîsa wî tevî Alaattin Kanat Apê Mûsa kuştîye û wan gel di serhildanê de gulebaran kiriyê...

Tevî vê rewşê jî dewleta tirk dev ji îtîfkarî bernade, ji bo ku mirovan bike îtîfkar xebata xwe didomîne. Her wiha ji bo ku gelek kes xwe bîspêrin

wê, zagona poşmaniyê ya nû derdixe.

Li aliyê din Ûlkücüyên berê jî bi riya Serokê Partiya Karkeran (İP) Doğu Perinçek îtîrafên xwe dest bi îtîrafan kirin. Perinçek tevî Ûlkücüyê berê Veysel Kaya roja 12'yê reşemiyê civîneke çapemeniyê li dar xist. Veysel Kaya di vê civînê de gelek îtîrafên balkêş kirin. Li gorî gotina Kaya kuştî-nên berî 12'yê rezberê bi fermana Muhsin Yazıcıoğlu pêk hatine. Di kuştina Kemal Türkler, Ümit Kaftancıoğlu, Doğan Öz û Cevat Yurdakul de her çiqas kesên mîna Abdullah Çatlı, Oral Çelik, Mehmet Şener tetik kişandibin jî, emir ji Yazıcıoğlu derketiye. Veysel Kaya da zanîn ku di kuştinan de hêzên dewletê ji bo wan agahiyên îstîhbarî berhev kirine, çekên van veşartine, dema pêwîst bûye, ew li erebeyên xwe siwar kirine û ji cihê bûyerê dûr xistine.

Rewişteke kapîtalîzmê ya din jî ev e, dema bazara tiştêkî hate saz kirin, êdî tu kes nikare rê li ber kirin û firotina wî tiştî bigire. İcar bazara îtîrafan jî hate saz kirin, wê her tişt derkeve rastê. Tiştê girîng ev e: Gelo emê karibin agahiyên pêwîst ragihînin gel, pê gel hişyar bikin û hesab ji sûcdaran bixwazin?

# Bi aqilê hinekan fikirîn çi ye?

HASAN HARAN

**M**irov ji hev dipirsin; çima mirov bi aqilê hinekên din difikire, çima mirov bi aqilê xwe nafikire? Sedema vê pirsgerêkê çi ye? Mirov sedema vê pirsgerêkê di dîroka mirovahiye de dibîne.

Dema mirov li dîroka mirovahiye dinihêre; sê tiştan dibîne. Ev sê tişt sê kesani ne: Yek jê; ji destpêka civakbûnê û heya roja îro bi aqilê xwe fikiriyê, carinan rîsteke pêşverû listibe jî, lê bi gêmperî rîsteke paşverû listiye û pêşiya pêşketina civakê an girtiye, an jî daye sekinandin. Ev hem bi kesani ye, hem çînî ye. Vê kesaniyê, her dem fikra xwe, aqilê xwe li ser civakê serwer kiriyê. Bi vî awayî serweriya xwe li ser civakê bi kar aniyê.

Yek jî jê; di bin vê kesaniya ku me li jor aniyê ziman hatiye hemparkirin. Yanê di bin zilma wî, di bin dijwarî û aloziya wî ya pergala de hatiye bihêz kirin û tewandin. Lê tewandina vê kesaniyê ji ber aloziya bandoriya pergala çînî ya wê tîpa jor e ku hatiye ziman, bûye serdest; ev jî bûye bindest. Ev tîpa ku di hêza duymîn de hatiye ziman, hêza wî ya xwesar heye, ne ku tune. Hêza wî jî heye, aqilê wî jî heye, yê ku di jiyana de pir hilberîn û xebatê jî dike dîsa ev tîpa e, yanî ev çîn eLê jî ber ku bindest e û nikare aqilê xwe bi awayekî serbixwe û azad

**Şexsiyet kole û azadnebûyî, nikare bi vîna xwe bi awayekî serbixwe xebatê bike, çalakî bike û berhemên baş biafirîne. İro di nav şerê azadiyê de ev pirsgerêkeke tê jiyân. Ji ber ku gelek ji me xwe jî bandora dijmin rizgar nekiriye.**

bîne xebitîne, zêde bi pêş neketiye. A din jî, ku di navbera van her du tîpên xweser de mane. Carinan li pey yekî ye, carinan jî li pey yê din e. Sedema vê jî bêhêzî, Lawazbûna aborî û neserweriya hilberî ye. Lewma jî her dem di navberê da diçe û tê.

Ew bi aqilê xwe nafikire, aqilê wî yê ku heye jî, ji hêla serdestan ve hatiye dayîn. Lewma jî carinan bi aqilê çîna jorin difikire, carinan jî li gorî berjewendiyên xwe, bi aqilê çîna bindest difikire. Heger yê bindest xurt bibe û yê serdest ji hêz bikeve, ew dem xwe dide piştê bindest û aqilê wî ji xwe re dipejirîne. Bi vê kesaniya navîn bawerî nayê.

Li ser lingê xwe heya dawî nikare bisekine. Tirsonêk e, li mêzinê dinihêre, li fersendan digere, çawa li hesabê wî bê wisa lebat dike. Bi kurtasî kîjan giran be xwe dide hêla wî. Kesaniya navê, du rûyê wî heye, sê zimanê wî heye. Di armancê wî de desthiatdarî tine, an jî ne ew qas xurt e.

A li vir bi aqilê hinekan fikirîn çi ye? Tê pêşiya mirov. Bi aqilê hinekan fikirîn ev tişt e ku, mirov bi tiştên serdestan xistiye mêjîyê mirov bifikire, bi wan ji-

yan bibe, lebat û xebat bike û berhemê de. Ev bingeha xwe ji mêjî û aqilê dijmin distîne. Yê ku bi vî aqilî bifikire bi rastiya xwe an nûnerê çîna navîn e, an jî nûnerê çîna kole ye. Serê van herduyan bi bîr û baweriyên serdestan hatine dagirtin. Lê ji hêla aborî ve jî mahrum û perîşan e. Tu tiştê wî tune ye.

Ev şexsiyet ji ber ku kole ye û azad nebûye, nikare bi vîna xwe bi awayekî serbixwe xebatê bike, çalakî bike û berhemên baş biafirîne.


Aqil, heger berjewendiya mirov, felsefa jiyana mirov îfade bike aqilê mirov e. Ji bo nimûne, îro ramanên Serok, berjewendî û jiyana hemû bindestan, hemû kesên ji serdestan xisar dibînin, îfade dike. Ew fikir û aqil hem neteweyî, hem jî çînî ye. Ev bîr û ramanên serkeftin, berxwedan, azadî, serxwebûnê ne. Ev ramanên mirovahiye ne.

Baş tê zanîn ku, ji vir şûn de bi aqilê dijmin fikirîn windakirin e, dîsa koleffî ye, bindestî ye û ji dema derbasbûyî jî ne cuda ye. Kî bi aqilê dijmin bifikire, niyeta wî çiqas baş dibe bila bibe, livbazî û gavê ku biavêje, berhemên wî mutleq diçin ji dijmin re.



Li gorî daxuyaniyê ARGK'ê, gerîla di meha rêbendanê de beramberî operasyoneke hêzên dewletê sê operasyon pêk anîne. Tê gotin ku di meha rêbendanê de 21 jê cerdevan 95 kes jî hêzên tirk hatine kuştin. Di daxuyaniyê de tê eşkerekirin ku di heman demê de ji hêzên gerîla jî 35 kes hatine kuştin.

Li aliyê din li gorî nûçeyê rojnameya The Guardianê, roja 27'ê rêbendanê 1996'an raporek ji MGK'ê re hatiye pêşkêşkirin. Di vê raporê de tê xwestin ku li ser sînorê başûrê Kurdistanê li hêla Bakur deh 10 km. çargoşe bê valakirin û herêmeke tampon bê avakirin, da ku rê li ber çûn û hatina gerîla bê girtin.



KOMCIVÎNA asayî (adetî) ya PKDW'ê ya 18'an, roja 11'ê reşemîya 1997'an li Bruksela Belçikayê pêk hat. Komcivîna di bin serokatîya Serokê Konseya Rêveber a PKDW'ê Zübeyir Aydar de çêbû.

Di komcivîna de biryar hate girtin ku heyetek ji PKDW'ê her tim li başûrê Kurdistanê bimîne. Her wiha biryara xurtkirina xebatên ji bo yekîtiya neteweyî jî hate girtin. Li gorî agahiyên, wê rêveberîya PKDW'ê li ser rêxistinên kurd bigere da ku ew beşdarî hîlbiartina parlamentoyê ya bê, bibin. Di serî de li Fransa û Almanyayê, wê parlemento giraniya bide çalakîyên diplomatîk li seranserî cîhanê û ji bo pîrozkirina Cejna Newrozê amadehiyan bike.

## NÛÇE

# Amerîkayê rapora xwe ya 96'an weşand:

# Qetlîama Basayê hêzên dewletê kiriye

**Amerîkayê rapora xwe ya der barhe mafên mirovan a sala 1996'an weşand. di vê raporê de li ser gelek îhlalên mafên mirovan ên li Tirkîyeyê tê sekinîn û tê daxuyakirin ku rewşa mafên mirovan li Tirkîyeyê ji par ne baştir e. Her wiha di raporê de tê gotin ku qetlîama Basayê hêzên dewletê kiriye.**

Wezîriya Dewletê ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) rapora xwe ya mafên mirovan a sala 1996'an roja 30'yê rêbendanê belav kir. Di vê raporê de beşek ji li ser rewşa mafên mirovan a Tirkîyeyê ye. Ev beş ji 33 rûpelan pêk hatiye; tê de digel bîr û baweriyên dewletê agahiyên balkêş jî hene.

Ev rapor li pey daxuyaniya rayedarên amerîkî ya bi rengê "Rewşa neyînî ya mafên mirovan li Tirkîyeyê, divê li ber endamtiya vê dewleta ya Yekîtiya Ewropayê nebe asteng" hat. Vê yekê jî girîngiya wê raporê zêde kir. Dîsa ev rapor hêjayî nixandîna ye ji ber ku helwesta dewleta amerîkî nişan dide. Ji zimanê raporê tê fêmkirin ku, amadekarên raporê xwestine hevkêşiyekê pêk bînin di navbera kirinên PKK'ê û dewletê de, lewre rapor piştî her kirina hêzên dewletê ya li dijî mafên mirovan "terorîstbûna PKK'ê" bi bîr dixe.

Wekî mînak, hê di destpêkê de pêşî tê gotin ku li Tirkîye sistema parlementer heye, dewlet li dijî PKK'ê têkoşînê dide û ji ber vê yekê li 9 bajaran rêveberîya ne-asayî heye. Li dû van gotinan têdaxuyandin ku, li herêma ne-asayî hinek endamên hêzên ewlehî wekî cendîrme, tîpên taybet û polîs kirinên dûrî rêz û rêçik mafên mirovan pêk tînin.

Dîsa di raporê de tê gotin ku di hinek warên mafên mirovan de rewşa Tirkîyeyê li gorî sala 1995'an xerabtir bûye. Rapor dibêje ku rewş bi taybetî li Başûrê Rojhilat xeternak e, lewre hikûmetê mafên kurdan ên çandî û zimanî paşçav kirine. Wekî beşekî têkoşîna li dijî PKK'ê hejmareke mezin a mirovên ne aliyê şer ji cih û war hatine kirin, îşkençe li sivilan hatiye kirin û mafê derbirinê (îfadeyhe) hatiye astengkirin.

Rapor li ser tevkujiya Basayê jî ra-

westiyaye û tê gotin ku ew bûyer ji aliyê hêzên dewletê ve hatiye kirin. Li ser vê bûyerê ev tişt cih digirin di raporê de: "Di rêbendanê (1996) de minibûseke ku tê de 11 kes hebûn (hinek ji van aligirîna partiya kurd bûn) hate şewitandin, ew kes hemû hatin kuştin. Hikûmetê PKK'ê ji ber vê bûyerê sîncdar kir, lê "Koma ji bo aştiyê bi hev re" ku komeke serbixwe ye, gihîşt wê encamê ku hêzên ewlehî ji vê bûyerê berpîrs in."

Li aliyê din kesên ku rapor amade kirine, daxuyaniyên heman komê yê der barê kuştina mamosteyan de li ber çavan negirtine û kuştina mamosteyan xistine stûyê PKK'ê.

Rapor dide zanîn ku di navbera 330 hezar û 2 milyonî de mirov ji cih û warê xwe bûne. Her wiha rapor diyar dike ku bînpêkirina mafên mirovan bi herêma kurdan ne sînorîkirî ye û balê dikişîne ser kuştinên bêdarizandin, îşkence û windakirinên li herêmên rojavayî. Tê gotin ku, ji kuştina Metin Göktepe berpîrs 48 û ji ber îşkenceyan ku li zarokên li Manîsayê 10, ji ber îşkenceya ku li Gülderen Baran hatiye kirin ji 5 û ji ber hinek dozên îşkenceyê yê din gelek polîs tene darizandin. Lê rapor dide zanîn ku darizandina polîsan ne hêsan e. Bo nimûne, ji bo darizandina hêzên ewlehî yê li herêma kurdan destûra waliyê herêma pêwîst e.

Rapora DYA'yê balê dikişîne ser rewşa girtîgehên û qala 12 kesên ku di rojiya mirinê de can dane û deh girtiyên ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatine kuş-



tin. Her wisa jî tê gotin ku 135 rojnameger hatine bîncavkirin, 11 heb ji van hatin girtin. Li ser mafê derbirinê jî wekî mînak berhevkirina pirtûka Melik Fîrat a bi navê "Fîrat Mahzun Akar" daye. Dîsa girtina Şanar Yurdatapan, cezakirina Yaşar Kemal, doza li hemberî Ertuğrul Kürkçü, Ayşe Zarakolu, rewşa İsmail Beşikçi di rapora mafên mirovan a dewleta amerîkî de cih girtine. Her wiha rapor eşkere dike ku 109 rojname, kovar û 8 pirtûk hatine berhevkirin. Çil rojname û kovar hatine girtin. Di raporê de li ser zimanê kurdî jî tê gotin ku qedexeya li serê dom dike, tevî ku weşandina stranên bi kurdî zêde dibe.

Mijareke din a ku di raporê de cih girtiye jî mebusên kurd û girtina rayedarên HADEP'ê ye. Dîsa tê gotin ku hêzên dewletê kesên ku bi mafên mirovan re eleqedar dibin tevgav dike. Wekî nimûne ji helwesta li hemberî rayedarên Weqfa Mafên Mirovan hatiye dayîn.

Rapor li ser rewşa dadgehên tirk jî radiweste û dide zanîn ku gelek kes ji ber ku li dadgehên hundirîn tiştêkî bi dest naxin serî li Dadgeha Mafên Miro-

van a Ewropayê dixin. Tê gotin ku li gorî çavkaniyên Wezîriya Karê Derve ya Tirkîyeyê heta meha gelawêjê 424 kesî serî li vê mehkemeyê daye, ji van 374 heb tene nixandîna, 73 heb hêjayî dozvekirinê hatine dîtin ji layê Komîsyona Mafên Mirovan a Ewropayê ve. Li gorî raporê hêzên dewletê bi texmîna 2400 gund û mezra vala kirine.

Rapor di bin sernavê "hindikahiyên neteweyî, nijadî û qewmî" de bi giranî li ser kurdan radiweste. Di vî warî de tê gotin ku Qanûna Bingehîn, kurdan wekî hindikahiyê neteweyî, nijadî û qewmî nas nake. Tê gotin ku li ber beşdariya kurdan a nava jiyana rojane çî asteng nîn e, lê kesê ku nasnameya xwe ya kurdî didin zanîn xesarê dibînin. Her wiha tê gotin ku her çiqas piştî 1991'ê materyalên bi kurdî zêde bûbin jî, divê hemû dan û standinên siyasî bi tirkî çêbe. Dîsa hemû materyalên li ser çand û ziman û dîroka kurdî bi hinceta cudakariyê tene berhevkin.

Di raporê de li ser mafên rêxistin û sendîkayê, mafên zarokan, mafên jinan û mafên hindikahiyên olî jî tê rawestîn.

SAMÎ BERBANG

# Rewşenbîrekî têkoşer

## İsmail Beşikçi

**Mamosta Beşikçi dibêje: "Li gorî Mustafa Kemal (1930) ji ber ku gelê silavî li çand, zimanê xwe xwedî derketine, kovar û pirtûk nivîsandine, balkan ji destê tirkan çûye. Ji bo ku Kurdistan ji destê wan dernekeve, qedexetîya zimanê kurdî, di warê çand, wêje û zargotina kurdî de astengkirin, astengên di warê lêkolîna dîroka kurdan divê bi cih were."**

**D**i vê nivîsa xwe ez dixwazim bala xwendevanan bikişînim ser ramanê Mamoste Beşikçi. Lewre em li ser ramanên mamoste yê der barê ziman, çand û zargotina kurdan de rawestin.

Mamosta Beşikçi heta niha sî û sê (33) pirtûk li ser gelê kurd nivîsandine û ev pirtûk ji aliyê weşanxaneyên cur bi cur ve hatibin weşandin jî, rola xwediyê Weşanên Yurtê û xwediyê wê Ünsal Öztürk girîng û pîroz e.

Mirov li kîjan vejêra (berhema) Mamosta Beşikçi dinêre, xuya dibe ku giraniya ramanên wî li ser ziman, çand û hunera kurdan e. Ango Beşikçi Xoco gelê ku bi azîneke zanistî hildide dest û li gorî pîvanên objektîf netewebûna wan dîselmîne. Berî ku ez ji pirtûkên wî yê wekî 'Mêtingeha Nav-Dewletî Kurdistan' û Ramanine li ser Rewşenbîrên Kurd' ramanên wî veguhêzim, ez dixwazim tişteki din binim ziman.

Gava ku di sala 1991'ê de Enstîtuya Kurdî li Stenbolê vedibû, ji bo serokatiya wê, birêz Cemşîd Bender, pêşniyaz dike ku Beşikçi bibe serok. Lê belê Beşikçi, napejirîne vê pêşniyazê û sedemê wê wiha tîne ziman: "Ziman û çanda kurd wekî gulên bexçeyan in. Ev gul û bexçe ji aliyê dewleta tirk ve bi tîlên kelem ji çar aliyê ve hatiye girtin û her ku diçe hişk dibin. Mebesta têkoşîna min ew e ku ev tîl bêne qetandin û gelê kurd gul û bexçeyên xwe av bidin. "(Ji devê Birêz Cemşîd Bender) wateya gotina Mamosta Beşikçi ev e ku ew bi zimanê kurdî nizane û lewre jî di cih de nabîne ku bibe serokê Enstîtuya Kurdî."

Birêz Şanar Yurdatapan, li İzmirê beşdarî panelekê bû (30 berfêbîn 1996) û der barê çalakîyên "Azadî ji bo Beşikçi" de axaftinek kir. Yurdatapan di axaftina xwe de wiha got:

"Ger Beşikçi azad nebe, tu rewşenbîr azad nabin. Azad bibin jî, azadiya wan nabe azadiyeke mayînde. Wê dîsa bikevin hundir. Ger Beşikçi azad bibe, fêm bikin ku azadiya gelê kurd jî dest pê dike. Ji ber vê, wê azadiya Beşikçi wê daxwaza sereke ya çalakîyên me be."

Niha jî em derbasî nêrînên wî yê li ser ziman, çand û zargotina kurdan an li ser rastiya neteweya kurd, bibin.

Bi gelemperî gava ku mirov li pirtû-

kên wî dinêrin ji axir heya oxir ango ji serî heta dawiyê, tê dîtin ku pirtûkên wî yê pêşî li ser hebûna kurdan hatine nivîsin. Yanê mesaja ew e: Divê gelê kurd xwedî mafê çarenûsa xwe be. Berhemên dawîn jî didin zanîn ku dewleteke serbixwe mafê gelê kurd e.

Mamoste Beşikçi di xebatên xwe de daye xuyakirin ku ew 'Rewşenbîrekî têkoşer û têkoşerekî rewşenbîr' e. Bi vê helwesta xwe derseke mezin û girîng li hêlekê daye komara tirk, li hêla din jî daye rewşenbîrên tirk û hinek rewşenbîrên kurd û pêşewatîyeke dîrokî kiriye. Roj hat, Mamoste Beşikçi ji karmendekî bigirin heta Serokê Geştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ên ku bi zimanê kurdî naaxivin, rexne kirin.

Binêrin Mamoste Beşikçi di pirtûka xwe ya bi navê 'Mêtingeha Nav-Dewletî: Kurdistan' de welatê kurdan çawa tarif dike:

"Welatêkî ku nebûye mêtingeh; neteweke ku nebûye mêtingeh; welatêkî bênasname; neteweke bênasnav..." Di vî warî de ramanên xwe bi minakan xurt dike, bi awayekî zanistî digihîne encamê. Li gorî wî di bîngêhê ramyariya tirk a li ser gelê kurd de nijadperestî heye. Di vî warî de wiha dinivîsîne: "Divê nijadperestî, her dem wekî çawa ku li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê û Başûrê Afrîka bi veqetandina taxên niştecih, veqetandina qehwexaneyan û hwd. tê dîtin, divê neyê fêmkirin. Nijadperestîya tirk bi rengekî din e. Dewlet terorê bi pêk tîne da ku ziman û çanda kurdan ji holê rake; çand û zimanê tirkî bi kurdan bide pejirandin. Înkarkirina ziman û çanda kurdî pêk tîne û kurdan hemîyan tirk dihesibîne. Di dinyayê de li cihêkî din hempayê vê nijadperestîya tirkan tune ye. Nijadperestîya dewleta tirk bi vî taybetîya xwe ji ya Afrîkayê jî xeteretir û paşverûtir e."

Li gorî Mamosta Beşikçi, dewleta tirk siyaseteke wisa li ser gelê kurd bi kar tîne: "Par bike, bi rê ve bibe û winda bike" (...) di bîngêhê û mebesta vê siyasetê jî de ew heye: Nixkên ku tîne windakirin, kok tê kolandin seranser taybetîyên neteweya kurd in, mafên netewetîya kurdî ye, kesayetîya kurdistanî ye.

Mamosta Beşikçi dibêje: "Li gorî Mustafa Kemal (1930) sedemên ji dest

derketina Balkanan ev e, gelê silavî li çand, ziman û zargotina xwe xwedî derketine, kovar û pirtûk nivîsandine. Ji bo ku Kurdistan ji destê wan dernekeve, qedexetîya zimanê kurdî, di warê çand, wêje û zargotina kurdî de astengkirin, astengên di warê lêkolîna dîroka kurdan divê bi cih were. Divê şopa ziman, çand, wêje û dîroka kurdan nemîne; jiyana kurdîtiyê jî holê rabe."

Der heqê çand, ziman, wêje û zargotina kurdan de nêrîn û ramanên Mamoste Beşikçi mirov dikare hîn jî pirtir bike. Em dixwazin çend minakan ji pirtûka wî ya bi navê "Ramanine li ser rewşenbîrên kurd" bidin.

Mamoste hema di sergotina pirtûkê de wisa dibêje û rewşenbîrên kurd rexne dike: "Civakek bêyî rewşenbîr nayê fîkirîn, her civakê rewşenbîrê xwe afirandîye. Lê, civaka kurd hîn ne xwedî rewşenbîrê xwe ye"

Birêz Beşikçi di xebata xwe ya zanist de, rewşenbîrên kurd destnîşan dike, wekî rewşenbîrên misilman (olperest), enternasyonal (marksîst)... Li gorî wî ew cure rewşenbîr ji rastiya neteweya kurd dîr ketine û ji wan re ziman, çand, wêje û zargotina kurdî ne girîng e. Rizgarî bi marksîzmê be jî û bi ola îslamê jî pêk bê, wê gelê kurd bigiheje mafên xwe. Ne hewce ye ku mirov doza mafên neteweyî bike

Mamoste qala bîranîneke xwe ya li Girtîgeha Amedê dike. Helwesta kurd kurd, şeroşgerê berxwedêr Edip Karahan bi bir tîne. Edip Karahan jî di girtîgehê de ye. Gava ku lêzim û mêvanên Edip Karahan tîne, ew bi wan re bi kurdî diaxive. Ev jî bi leşkerê tirk ne xweş tê. Leşker hema axaftina wan dibirin û dibêjin: "Bi tirkî biaxivin." Lê Edip axaftina xwe bi kurdî didomîne. Mamoste dibêje: "Ev jî ji bo min tişteki pir dilxweş bû. Min bi saya helwesta Edip, guhartin di rewşenbîr û neteweya kurd de



didîtin."

Mamosta Beşikçi, rexneyekê ji PKK'ê re jî tîne. Bi kurtasî wiha dibêje: "Ez fêm nakim PKK çima ew qas bi zimanê tirkî xebatên xwe dike?" Di pirtûka bi navê 'Li Kurdistanê pirsra kesayetîyê' de tê gotin ku her endamê PKK'ê bi neteweya kurd ve girêdayî be, ji gelê kurd hez bike, ji bo rizgariya Kurdistanê xwe gorî bike û hwd. Lê ji bo ku şervan hînî ziman bibe; çand û hunera kurd bi zimanê xwe nas bike. Min qet ev tişt jî fêm nekir ka çima endamê PKK'ê xwe bi zimanê xwe naporêzin. Li Dadgehên Ewletîya Dewletê (DGM). Bi kesayetîyeke biryarî xwe bi zimanê kurdî biparastina, wergêr bixwestina, wê çawa bi-bûya gelo?!

Çaran; Ferhat, Eşref, Necmî û Mahmut gava ku xwe şewitandin-û pakrêwan bûn, nemir bûn; dû re Kemal, Hayrî, Akîf û Ali pakrewan bûn, di vê navê de van şehîdan bi kurdî bi axiviyana û mêtinkarî şermezar bikirana wê helwesta wan hîn bi manîdar nebûya gelo?!

Mamoste Beşikçi bi cesaret rexneyên xwe li hemî rêxistin û kesan digire. Ew kesekî xwediyê şerefa zanist e, hem li Tirkiyeyê û hem jî li dinyayê. Li gorî wî 'kurd ne kurdên berê ne'. Raste ev tesbît û êdî kurd li tirkî tev hemû rewş û mercên dijwar, astengên li dijî demê bi zimanê xwe kovar, rojname û pirtûkan diweşînin, sazgehan vedikin. Xebat û ramanên Mamoste Beşikçi yê der barê çand, ziman, wêje û dîroka kurdan de tîne peyitandin.

FEREC ÇOBANOĞLU

# Dahûrîna peyvvan (7)

**E**v demeke dirêj e ku me navber dabû xebata xwe ya bi navê "dahûrîna peyvvan." Em di xebata de, bi taybetî li ser peyvên hevedudanî disekinin û em lê dixebitin ku em wan ji aliyê morfoloji û etîmolojiyê ve rave, yanê îzah bikin.

Di vê nivîsa xwe ya hanê de jî, em dê bidine ser eynî rêçê.

**Govend:** Ev peyvya me çendî mîna peyveke xwerû ango sade xuya bike jî, ew di rastiya xwê de peyveke hevedudanî ye. Em di serî de bibêjin ku ew ji "gov" û ji parkîta (paşgira) "end"ê çêbûye.

Peyva "gov" bi serê xwe xwediyê wateyekê ye. Ew û "kom"; "gom" û "kew" eynî ne. Lê bi qonaxa demê re tê de hem ji aliyê teşe û şeweyê ve û hem jî, ji hêla wateyê ve guherîn çêbûne. Tev ji tînan maneya civat, civ û grubê.

Çawa ku "koma pez" tê gotin, her wisa "goava pez û goava berxan" jî tê bikaranîn.

Kom, îro pirtir ji bo civata mirovan tê bikaranîn. Gom jî, ji bo cihê pez tê bikaranîn, heta jê re "zom" jî tê gotin, ku bi piranî ew li derveyî gund û li zozanan e. Kew, ku ligel parkîta "ar"ê wekî "kewar" durist dibe, ji bo şûna mîşên hingiv û her wiha di hundirê malan de ji bo cihê taybetê dextlê, nola genim, nok, nîsk tê gotin. Em der barê "kewar"ê de gotineke pêşiyar jî bi bîr binin: Gava nok dibarin keşe dikeve kewarê.

Li ser "gov"ê jî em rawestin, ku îro em peyvya "kovar" an jî "govar" bi kar tînin, di dewsa "mecmûa" erebî û "dergi"ya tirkî de. Ev pey jî hem wekî "kov"

û hem jî wekî "gov" di nav gel de tê bilêvkirin. Peyva "kovar"ê jî, ligel parkîta "ar"ê hatiye pê.

Kom, gom, kov, gov û kew tev eynî peyv e, tenê ji aliyê teşe û wate ve îro jî hev dîr ketine. Dûrketina wan jî, ji ber fonetîkê ye. Dengên ku jêderka wan, ango dengên ku cihê derketina wan yek be, bi hev diguherin. Cih didine hev û din. Heta dengên ku jêderka wan ne yek be jî, bi hev diguherin. Di fonetîkê de li gorî "qanûna hewla herî hindik" û "qanûna hewla herî pir", di peyvekê de

**Kom, gom, kov, gov û kew tev eynî peyv e, tenê ji aliyê teşe û wate ve, îro jî hev dîr ketine. Dûrketina wan jî, ji ber fonetîkê ye. Dengên ku jêderka wan yek be, û heta ên ku jêderka wan ne yek be jî bi hev diguherin. Di fonetîkê de li gorî qanûna hewla herî hindik û hewla herî pir, di peyvekê de deng jî diguherin.**

Ev yek jî, ji bo ku bilêvkirin (telafûz) bi hêsaniyê çêbe, diqewime.

Îcar em bala xwe bidine "kom, gom, kov, gov û kew"ê, em dê xweş bibînin ku jêderka dengên "k" û "g"yê yek e û ezmandevî ne. Her wiha di jêderka dengên "m", "v" û "w"yê jî yek e û levî ne.

Dibe ku di nav wan nimûneyan de peyvya "kew" zêdetir dêhn kişandibe. Em hinek li ser vê "kew"ê rawestin.

Belê, di zimanê me de dengên dengdêr û dengdar jî bi hev diguherin. Di nimûneya me li jêrê de dengê "e" û "î"yê bi hev guherîne. Nimûne:

hem = him, weha = wiha  
wenda = winda, felitîn = filitîn

Digel vê yekê kesên ku ji "kewar"ê re "kiwark" jî dibêjin hene, mîna Herêma Toran. Di vê peyvê de îcar sê hêman hene: kiw+ar+k

Me der barê parkîta "ar"ê de agahî dan, divê em parkîta "k"yê jî bi nimûneyan hinek rave bikin: ma+k, pey+k, bin+cil+k, bin+kiras+k...

Di peyv van daxuyaniyan de îcar em bîne ser "kiw+ar+k"ê û bi tenê "kiw"ê hildine dest. Di vê de jî, bi ya me dengên "o" û "î"yê bi hev guherîne:

mirov = meriv, hon = hin (an jî win)

Li dawiyê em daxuyînin ku guherîn wiha rûdaye: "kow" bûye "kiw" û ew jî bûye "kew." Jixwe em li ser dengên "m, v û w"yê sekinîn û me der barê wan de agahî dan.

Govend, çawa me li jorê ew jî hev dahûrand, peyveke hevdudanî ye, ew hem di cihê reqşê de û hem jî, ji bo navê reqsan tê bikaranîn. Kesê ku govendê digire, ji wan re "govengêr" an jî "govendgir", ji kesê ku serê govendê dikişîne re jî "sergovend" tê gotin.

Ji layê din ve li Semsûrê jî bo govendê peyvya "dîl"ê tê bikaranîn. Ligel vê, li devera Farqînê, ji bo dawetê "dîl" an jî "dîm" tê bikaranîn ku ew êdî di gotinên pêşiyar û stranên de maye. Wiha dibêjin: xweydilî (an jî xweydimî) hatin, ya-

nê xwediyê dilanê hatin...

**Bilind:** Peyv hevedudanî ye û ji aliyê teşeyê ve guherîn tê de çêbûye. Em peyvê jî hev der bixin: "bil" û "ind", ango "bal" û "end"...

Bal (bil), bi serê xwe xwedî wate ye û tê maneya "berz" a ku di kurmançiya jêr (sorani) û kirdkî (kirmanckî/zazakî) de heye. Di kurmançî de em dikarin du peyvên ku ji "bal"ê hatine çêkirin wekî mînak pêşkêş bikin: Balafir û balende.

Îro em balafirê jî bo "teyare"ya erebî û "uçak" a tirkî bi kar tînin. Di rastiya xwe de peyvya "balafir" tê wateya firendeyên (teyr û tulûrên) ku pir bilind difirin. Îcar balende (balinde) jî, ji teyran re tê gotin.

Li aliyê din, ji cureyekî balendeyan re "balaban" jî tê gotin, ku ereb jê re "se-ger" dibêjin. Her wiha kurd jî amûreke bayî (fûyî) re jî "balaban" dibêjin.

Ev her sê peyv (bale+fir, bal+ende û bala+ban) jî hevedudanî ne û bi alikariya parkîtan ji "bal"ê peyv hatine çêkirin. Tev jî bi bilindahiyê re eleqedar in.

Di "bil"ê de dengê "a"yê li "î"yê û di "ind"ê de dengê "e"yê li "î"yê dageriyane.


Navê "Serbulent", "Bulend", "Bilind" ... û "Bulent" a tirkî jî, ji "balend"ê tên.

end (ind), çawa me di peyvya "govend"ê de daxuyandibû, di zimanê me de parkîtek e. Ev parkîta hanê û ya "ende"yê (-dir+ende, bexş+ende, naz+ende) dibe ku yek bin jî. Lê îro jî hev cihê ne û her yek bi serê xwe nola parkîtekê xuya dibin.

ZANA FARQÎNÎ

## Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê Tirkiye sûcdar dît

CELALETTİN YÖYLER



**D**i sala 1994'an de ez wekî berendamê Serokatiya Belediyeya Melazgîrê hatim nişandan ji aliyê Partiya Demokrasiyê (DEP) ve. Lê pir mixabîni rejîma nijadperest serkeftina vê partiye di hîlbijartina herêmî de nexwest û ez hildame binçav. Ez 11 rojan di binçav de mam. Di dema pirsariya di binçav de, wan ez bi kuştinê tehdît kirim. Min bawer kir ku wê bi rastî jî min bidin kuştin, lewre berî min bi sedan endamên HEP, DEP û ÖZDEP'ê bi cîneyetên kontrayî kuştibûn. Îro rastiya wan cîneyetên kontrayî yek bi yek derdikevin holê.

Ji ber van dijwariyên hanê, ku rejîmê dihanî ser min, min bawer dikir ku ewê bi cîneyetên kontrayî min bidin windakirin, ji bêgavî ez ji bajarê Melazgîrê dîr ketim û ez çûm Enqereyê, di 27'ê meha pûşperê de ez beşdarî kongreya yekemîn a HADEP'ê bûm. Ji wir bi şûn ve sê mehên li ser hev ez nezivîrîm

welatê xwe. Di nav van sê mehên hanê de ez li bajarên wekî Mersîn, Edene, Stenbolê û di dawiyê de li bajarê Îzmîrê li cem hinek hevalên welatparêz bûme mêvan.

Demê ku ez li Îzmîrê mêvan bûm, bi telefonê bi gundê xwe re mijûl bûm, dem 15'ê meha rezberê bû. Dengê ku di telefonê de li guhê min xist û bersiva min da, dengê perîşanî, bindestî, koletî û belengaziye bû.

Ew deng, dengê malbata min bû ku di bersiva min de bi girîn û qirîn, digot: "Dijminê mirovahiyê biryar standiye ku xanî û malên me bişewitîne."

Di 18'ê wê mehê de, dişan bi tîkiliya telefonê ez bi wan re peyivîm; gotin: "Li ber çavên me îşev, saet 8'ê şevê mazot ji tratorên gundiyan kişandin, di xaniyê me werkirin û ew sotin. Em niha li ber diwaran mane." Demê ku xaniyê min şewitandibûn, ji malbata min, pîreka min, bûka min, sê keçikên min, kurekî min î 15 salî li gund bûn.

Vî çaxî bi riya dozgeriya Karşıyakaya Îzmîrê min daxwaznameya xwe ya şikayetê ji dozgerê Melazgîrê re şand. Pişt re, min li Komeleya Mafên Mirovan Şaxê Îzmîrê civîna çapemeniyê li dar xist û ev bûyera ne-mirovî ji raya giştî re daxuyand. Paşê min ev bûyera şewitandina xanî bi daxwaznameyekê gihande Serokê Projeya Mafên Mirovan a

Kurdistanê (KHRP) Kerim Yıldız.

Îro ez serkeftineke gelekî mezin ji bo mirovahiyê dibînim. Lewre doza ku me xwestibû li hemberî rejîma nijadperest a barbar ku cih û warê gelan dişewitîne, bidin vekirin, ji aliyê Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê ve hatiye pejirandin. Ev serkeftin ne ya min bi tenê ye, ya hemû gelê kurd ê mezlûm e, serkeftina mirovahiyê û serkeftina têkoşîna rizgariya neteweya kurd e.


Ez bi dîtî û ramanên xwe hemû kesên li cîhanê dijîn bira dibînim. Dijwariya li ser bindest û perîşanên hemû gelên cîhanê min diêşîne, ez mirovekî bawermend û mafparêz im, li cem min tu dijminahî ji gelê tirk re tune ye.

Ez dixwazim cîhanê bi demokrasî, bi pêkanîna mafên mirovan, bi wekhevî, bi serfirazî bête avakirin. Her wiha ez dixwazim hemû mirovên li ser vê xakê dijîn bi hev re, wekî bira bi sedan sal bişînin, di navbera wan de ne kuştin, ne talan, ne girîn, ne xwînrijandin û ne jî şewitandin hebe.

Daxwaza min ji berpîrsên rejîmê ev e ku hişên xwe bidin serê, kumê xwe deynin pîrsan ji xwe bikin, dest ji kuştin û talan û şewitandina gelê kurd berdin û di navbera her du gelan de aştî, biratî, wekhevî pêk binin.

Silav li têkoşîna rizgariya gelan.

# Her du rûyên aştiyê



Di dîrokê de hêvî, xeyal û armanca Însana tim û tim avakirina jiyaneke bêqirkirin, bêhovîti, bêkoçberî, bêxwîn, bêjan, bêhawar û bêhêstir e. Armanca, jiyaneke azad, wekhev, bi biratî ku tê de mafê jiyana her Însanî parastî ye. Ev jîyan bi xwe jî aşti ye. Ji bo vê yekê jî pir xwîdan û xwîn rijiyaye. Lewre îhtiyaca Însanan bi aştiyê heye, wekî îhtiyaca wî çawa ku bi xwarin û vexwarinê heye.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di 15'ê berfanbara 1995'an de agirbest îlan kir û da xuyakirin ku, çareseriyê pirsgirêka Kurdistanê di aştiyê de ye. Ev jî bû sedem ku aşti cihê xwe di rojevê de bigire û li serê, pir civîn li dar bikevin. Di van civîn û nûmayişan de, ji bo aştiyê gotûbêjên cur bi cur hatin kirin. Lê her kesî li gorî berjewendiyên xwe yên çînî li ser aştiyê fikir beyan kirin.

Di vê nîzîkbûnê de jî, nêrînê van kesan xuya bû ku alîgirê şer in. Ev rewş jî aliyê diyarkirina rengê aştiyê ve girîng e. Ev aşti an koletî ye, an jî demokrasî û azadî ye. Ev girêdayî hêza ku di şer de bi ser ketiye û karakterê wê ye. Emê li ser her du rûyên aştiyê bisekinin û bi kurtasî binin ziman.

Di dîrokê de hêvî, xeyal û armanca Însanan tim û tim avakirina jiyaneke bêqirkirin, bêhovîti, bêkoçberî, bêxwîn, bêjan, bêhawar û bêhêstir e. Armanca, jiyaneke azad, wekhev, bi biratî ku tê de mafê jiyana her Însanî parastî ye. Ev jîyan bi xwe jî aşti ye. Ji bo vê yekê jî pir xwîdan û xwîn rijiyaye. Lewre îhtiyaca Însanan bi aştiyê heye, wekî îhtiyaca wî çawa ku bi xwarin û vexwarinê heye.

Belê, di dîrokê de, hêviya kedkaran tim aşti bû, ji bo ku wê yekê pêk binin, pir şer kirin û serî hildan. Lê tu car ev hêvî pêk nehat û aştiyê bi mayînde nehat avakirin. Lewre, çînen ku hatine serê dewletê, ne ji bo rizgariya civakê, tenê ji bo ku berjewendiyê xwe biparêzin şer meşandine.

Heta derketina proleteriyayê rewşê ev bhuwe. Proleterya ji bo rakirina zilm, zor û xwînmijiyê ji bo wekhevîyê di nava

civatê de şer dîke. Wekî ku tê zanîn şer, domandina siyasetê bi hacetên din e. Siyaset jî temsîla armanca û berjewendiyên çînekê dîke. Ev jî bandora xwe li ser şer dîke û di nava xwe de jî li ser aştiyê. Nexwe heya ku çîn hebin wê şer jî hebe.

## Aştiya emperyalîstan

Hebûna şer jî, bi xwe re axaftin û zayîna fikra aştiyê derdixê holê. Ev bêhtir di sistema emperyalîzmê de xuya dibe. Bi giranî piştî hilweşîna sosyalîzma reel ji aliyê ve hêzên emperyalîst digotin "aşti" her wiha hêzên şoresger û tevgerên rizgariyê û rizgariya neteweyî jî aşti dixwestin. Bi hilweşandina reel sosyalîzmê re, emperyalîzmê di bin navê avakirina "Pergala Cihanê ya Nû" (YDD) de dixwest bibe hêza yekemîn û hakim li ser cihanê.

Ji bo sarkirina heremên germ ên ku li wan şer heye, di bin navê "aşti, mafên mirovan û demokrasiyê" de lê, li cihê ku wan sar bike, bêhtir agir gur bû û şer xurt bû.

Di bin vî navî de li dijî gelên azad û serbixwe eniyên şer vekirin û ew jî bi dagirkerî xistin bin destê xwe. Hin tevger û rêxistin, bi vê siyaseta emperyalîzmê hatin xapandin û ketin bin bandora vê siyaseta û bi vî awayî qeydên koletiyê bi xwe xistin destê xwe û di bin navê "aştiyê" de teslîm bûn, îrada gel şikandin, pasîf kirin, wekî Rêxistina Rizgariya Filistinê (PLO). Lê ew rewş dibe bîngehek ji bo teqîneke şoresgerî. Yanê ew siyaseta emperyalîzmê ya ku di bin navê "aştiyê" de dimeşîne, dibe sedema derketina şerên giran.

Emperyalîzm, dixwaze pêşengiya ge-

lê kurd jî bixapîne û vê siyaseta li ser PKK'ê bide meşandin, wê ji xeta şoresgerî dûr bixe û bêhêz û reformîst bike, bi vî awayî jî gelê kurd bêirade bihêle. Lê ditirse ku xwe nêzî PKK'ê jî bike. Lewre PKK xwedî serokatîyê ye ku wê xwe bi birdoza sosyalîzma zanistî pêçaye.

Gelê Kurdistanê jî bo serxwebûn û azadiyê pir şer kir. Lê bi ser neket. Lewre gel bi navê "biratiyê", "aştiyê" dihate xapandin. Neyaran bêirade dihiştin û hebûna wî ya neteweyî dihate înkarkirin û tu rê li pêş wî ku xwe tê de bine ziman nehiştin. Lê ji bo ku dagirker îrada gelê kurd û nasnameya wî ya netewî qebûl bike, tenê riyek û çareyek heye. Ew jî vekirina şerekî dijwar, şerekî şoresgerî li hemberî neyar e.

Ew şer wê rê li pêş aştiyê rast veke û bibe bîngeha yekîtiya gelê kurd û tirk li ser bîngeheke wekhevî û azadiyê. Felsefeya jîyanê li Kurdistanê ev e. Ev şer, bi zora şoresgerî tete meşandin. Bi vê zorê jî, Însan û jiyaneke azad û serbixwe tene afirandî. Ew gelê kurd û tirk rizgar dîke û aştiyê tîne.

Armanca şerê rizgariya neteweyî di bin pêşengiya tevgera azadiyê de derxistina îrada gel û nasnameyê wî ya neteweyî ye ku bi cihanê û dijmin bide qebûlkirin. Ji bo vê yekê jî, şerekî dirêj pêwîst e. Li hemberî vî şerî komara tirk şerekî pir qirêjî ji bo rakirina hêzên şoresger û çareseriyê pirsgirêkan di riya siyasî û aştiyê de. Ji ber ku kî li ser vê pevajoyê hakim be, însiyatîfê bi dest xwe ve wê bine û bîngeha serkeftinê di şer de biaveje.

Ev jî bi riya şixulandina pir reng û ce-

lebên taktîk û gavên cur bi cur di nav şer de pêk tê. Bi vî awayî çember li dor dijmin teng dibe û rejîmê dixê alozîke mezin ji her alî ve; wekî siyasî, leşkerî û aborî. Êdî rejîm nema dikare li ber xwe bide di rewşeke wiha de. Ji bo vê yekê jî agirbest tê îlankirin.


Lê komara tirk wekî çawa ku şerekî qirêj û taybetî dide meşandin, nêzîkbûna wî ji aşti û çareseriyê siyasî re jî xerab e. Ji bo vê yekê jî bersiva wan a sereke ji aştiyê re ev e: "Bila bîn teslîm bibin, qels bûne emê koka wan binin..." Belê aştiya ku komara tirk ji kurdan re dixwaze ev e. Ger wisa be, aştiya rast wê çawa bizê û ava bibe li Kurdistanê.

## Çima aşti û aştiyêke bi çi rengî?

Wekî ku me li jorê jî da xuyakirin, şerê şoresgerî bi serê xwe gel di tengasî û dijwariyê de dihêle ku êdî jîyan nema tê kişandin û şer jî nema dikare bimeşe. Divê li ser vê bîngehê jî aştiyêke birûmet ku tê de hurmeta îrada gelan tê parastin, bê afirandin. Ev jî bi avakirina hêzeke leşkerî ya xurt û bi şerekî mezî çêdibe.

Nexwe aşti wê bi bilindbûna şerê şoresgerî çêbe û bi xwe re azadiyê biafirîne û tê de her gel pêşeroja xwe û daxwazên xwe bine ziman. Her wiha tê de, biratî, hêvi ji bo mirovahiyê û rûmeta mafên mirovahiyê û nasnameya neteweyî ya gelan wê cih bigire. Belê, çareseriyê siyasî û aştiya rast ew e ku PKK dide xuyakirin, çareseriyê siyasî û aştiya li derveyî wê çemberê, teslîmîyet û xiyant e.

MEMED MEMEDÎ



- 18.02.1952 Tîrkiye bû endamê NATO'yê.
- 18.02.1993 Berpîrsê Rojnameya Özgür Gündemê yê Rihayê Kemal Kılıç (30), ji aliyê kontrayan ve hate kuştin.
- 18.02.1994 Navenda Partiya Demokrasiyê (DEP) ji aliyê dagirkeran ve hate bombekirin.
- 20.02.1909 Kovara Amîdî Sevda, li Stenbolê hate derxistin. Berpîrsê kovarê Alî Emîrî û xwedî jî Mehmet Şükrî bû. Kovar heta 6 hejmaran derket.
- 21.02.1991 Şaîr û helbestvanê kurd yê bi nav û deng Hejar, li bajarê Kerecê çû ser heqîya xwe. Hejar, di sala 1921'ê de li rojhilatê Kurdistanê li bajarê Mehabadê hatiye dinê. Navê wî yê rastîn Ebdurreh-

man Şerefkendî ye. Hin ji berhemên wî ev in: Alekol (helbest), Xeyam (helbest), Hejar Bo Kurdistan (helbest). Mem û Zîn a Ehmedê Xanî cara pêşîn wî vergerandiye kurdiya **mukrî-soranî** û çap kiriye.

● 22.02.1922 Rojnameya hefteyî ya bi kurdî Welat, li Stenbolê dest bi waşana xwe kir. Welat, ku bi sê zaravayên kurdî (kurmançî, kurmançiya jêr û kirdkî) tevî hev 115 hewmar derket derket. Rojnameya Welat di pêvajoya weşana xwe de li gelek astengên dewletê rast hat û dû şhid dan: Apê Mûsa û Hûseyin Deniz.

Li rojnameyê doz hatin vekirin û di encama darizînan de cezayê girtinê lê hatin bîrîn. Welat ku 16 rûpel û reş û spî bû, hejmara xwe ya dawî di 1-21 gulana 1994'an de weşand û weşana xwe da sekinandin.

## AWIR

# Bayê Elegezê



**Di lîstikan de bicihkirina aforîzmayan zehmet e. Ji ber vê jî divê gava ku bi awayakî fîlozofî aforîzma tîn bikaranin bi baldarî li ser bê rawestî. Gava ku wisa nebe, ev mesajên xweşik jî di vê tevliheviyê de winda dibin.**

Beşa şanoyê ya NCM'ya Stenbolê perdeya xwe bi lîstika bi navê "Bayê Elegezê" vekir. Lîstik bi destê Kemal Orgun hatiye nivîsîn. Di lîstikê de 17 kes rol digirin. Lîstikvan şagirtên Şanoya Hêlîn (SH) in. Beşa Şanoyê, bi xebatên bi vî rengî dixwazin akademîyêke teatrê pêk bînin.

Divê hem ji aliyê şeweya nivîsînê ve û hem jî ji aliyê teknîka lîstikê ve, li serê bê rawestî. Hin lîstêkên otantik ku li hin herêmên kurdan tîn pêşkêşkirin (wekî Kalik û Fatik) tu car jî bo pêşerojê nehatine nixxandin. Ji ber vê sistiyê ye ku encamên baş di vî warî dermeketine holê û pêşveçûn tune ye.

Bayê Elegezê bi tîkildarî û xeberdana du çiyayên Kurdistanê dest pê dibe. Ew xeberdan bi awayekî dengbêjî ye. Pêşî şer di navbera wan de çêdibê, nifiran li hev dikin. Problema wan a herî mezin li ser hezkirina Çemê Eresê ye. Lê ev şeklekê eşkere ye. A weşarî ev e: Gelo gelê Kurdistanê bi taybetî jî serhedî jiyana xwe jî kê dizanin û ji kijanî hez dikin?

Dû re li hev tî. Lîstik dide zanîn ku berfa serê Çiyayê Agirî (Araratê) ji ber nifira Çiyayê Elegezê tê û her wiha ji ber nifira Çiyayê Agirî jî, Çiyayê Elegezê bûye helîna mişk û maran. Nivîskar çiyayên hemû herêman bi nav dibe û pesnê wan dide, lê navê Dêrsimê di nav wan de cih nagirin. Wekî ku nivîskar jê sût ye (xeydiye), dilîkêstî ye. Gelo çima? Ma li ser çiyayê wan herêman şer, zîlm û berxwedan nîn e? Ev terciha ni-

viskar e.

Wekî din jî divê li ser honandin û tîkilyên navbera prologan û rolê kesan baş bîn rawestî. Gava ku tîkildariya wan baş neyê çêkirin, encameke xurt ne mîmkûn e derve holê. Di dawiyê de, divê mijar bê sivikkirin. Di lîstikan de bicihkirin forîzman zehmet e. Bo mînak: Em bibêjin ku berfa ser Çiyayê Agirî ji ber nifira Çiyayê Elegezê peyda bûye, dema ku ew li hev hatin, ew berf çima ranebû? Divê honandina lîstikê, dîsa di ber çavan re derbas bibe. Ji aliyê şanogeran ve em Şekiro û stranbêjê (divê beşên muzîkê jî, ji dengê wê ya xweşik istifade bikin) pîroz dikin. Lê dîniya (Şekiro) wî zêde tune bû. Divê hinekî din bişibîne wî tipî (dîn).


Plana rêwîyan pir dirêj e. Çerçî li ser rola xwe zêdetir bixebite û zelaltir bi-axive. Plan û peyvên peykervan qels mane. Divê di monîtorê de lê bê temaşekirin û nixxandineke nû li ser bê kirin. Ji ber ku baweriya me çêbû ku cewherê ku ji hunerê re lazim e, ew di dil û mêjiyên wan de heye.

Lîstik jî aliyê muzîkê ve gerek bê pîrozkirin. Ji aliyê ronahîkirinê ve giran dimîne, divê li ser vê jî bê rawestî. Peyker gelek baş bû. Di dawiyê de em bibêjin ku, her çiqas ev kêmasî hebîn jî, ev lîstik hêjayî temaşekirinê ye. Afirandina berhemên wisa rê li ber yên baştir vedikin. Ji ber vê jî, di pêşî de nivîskar, hemû hunermed û kedkarên lîstikê ji wan tecrûbeyan gelekî istifade bikin.

DÜZGÜN DENİZ

## ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



## Ez û rojnameyên Welat

Ez ji hejmara yekê (22-29- sibat, 1992) ya rojnameya Welat ve heta niha nivîsan dinivîsimin. Heta hejmara heştan min li derfî quncikê nivîsand û ji hejmara heştan pê ve jî, êdî min dest pê kir her hefte di quncika "Pênûs" de nivîsand. Ji derfî quncika Pênûsê bi navê xwe, bi navekî din û bînav gelek nivîsarên min di Welatê hatin weşandin. Ez bawer dikim ji ber sedemên teknîkî dibe ku çend nivîsar di dema xwe denegihîştîbin rojnameyê, lê dîsa min hewl dida xwe ku her hefte nivîsar ji rojnameyê re bi rê bikim. Dema weşana Welat hat rawestandin û piştî re bi navê "Welatê Me" dest bi weşanê nû kir, (hejmar 1, 20-26 sêrmawez 1994) dîsa min nivîsarên xwe şandin, lê wê carê ne her hefteyî, ji du hefteyan carekê min nivîsarên xwe yê quncikê domand. Piştî re Welatê Me jî bi zordestî û çewsandina dagirkeran û ji ber hinek sedemên aborî û teknîk weşana xwe rawestand û bi navê "Azadiya Welat" (hejmar: 1, 21-28 rêbandan 1996) dest bi weşanê nû kir. Min dîsa jî bo du hefteyan nivîsarên xwe yê quncikê heta îro nivîsandin, bi rê kirin û ez hê jî bi rê dikim.

Dibe ku hinek xwendevan bibêjin:

- Êee. Ka çî di bin zimanê te de heye, vemeşêre û zû bibêje? Yanê tu dixwazî bibêji, "Ez ji vir şûn ve êdî nanivîsim?"

- Na, ez nabêjim êdî nanivîsim!

- Lê, wê demê derd û kulên te çî ne? Tu westiyayî an jî di tûrikê te de êdî tiştek nema, çî ye?

Na, we tê demexist... Ka rawestî, ez ji we re bibêjim. Ez dixwazim hinek gazind, lome û rexneyên xwe li hevalên xebatkar û berpîrsên van rojnameyên Welat, Welatê Me û Azadiya Welat bikim. Ew, bê ku min agahdar bikin, gelek caran di nivîsarên min de hinek guhartinên biçûk çêdikin. Di şûna hinek peyv an jî gotinan de, peyvên çêkirî bi kar tînin. Bi taybetî navên mehên salê diguherînin. Carinan hevok an jî çend hevokan derdixin yanê li gorî wê ne nivîsarê kurt dikin. Lê, dema ku kurtkirin ne di cihê xwe de be, wê demê wateya (maneya) nivîsar û hevokan dikare ji binî ve bête guhartin an jî tiştekî jê neyê fêmkirin. Carinan jî, heval paragrafê min diguherî. Çend paragrafan dikin ser hevdu û ji wan paragrafeke dirêj çêdikin. Dibe ku ev jî ber cihê bûnê be; lê dîsa jî, guhartina paragrafan bi qasî kurtkirina hevokan tesîr li ser nivîsarê dike. Paragrafê dirêj çavên xwendevan ji xwendina nivîsarê ditirsîne, zewq û hewildana wan dişikîne.

Gazind û lomeyê min a din jî ev e ku, ez bi xwe aboneyê rojnameyê me. Peryê abonetiye jî pêşî didim, lê dîsa jî rojname bi awayekî serûber ji min re nayê. Gelo sûtê min çî ye? Wekî mînak; bi qasî mehekê rojname nehat, lê piştî serê sala 1997'an di carekê de, di nav zerfêke mezin de pênc hejmar bi hevdu re hatin. Lê mixabin piştî re ev av dîsa lê zelal bû û nehat. Ev jî mehekê zêdetir e ku min rû û rûçikê rojnameyê nedîtiye, ka çawa ye. Berê dema rojname nedihatî, min postexaneyê komara Tirkiyeyê tawanbar dikir; lê divê ez rastiyê bibêjim, ez niha dudil im. Hezar mixabin ez piçêk jî, ji hevalan piştîkul im!

Her sêsemê dema ku ez ji kar vedigerim malê, bi vekirina derfî re pîrsa min a yekê li ser hatin û nehatina rojnameyê ye. Di van mehên dawiyê de êdî min hêviya xwe jê bîrî. Heger hat wekî toto ji min re lê bixe û heger nehat jî wekî ku totoya me bi çem û çem bi avê re here! De were jî vê rojnameyê re nivîsarên quncikê binivîsînê? Rojnameya ku tu nabîni û nizani çawa ye?

Di karûbarê rojnamegeriyê de tiştekî gelek girîng heye ku ew jî, di demê de, bi awayekê serûber rêxistinîkirina weşanê û belavkirina wê ye. Heger mirov rojname an jî kovar derxe, di dema wê de belav neke û nekeve destê xwendevanan, ew rojname an kovar li ber mirinê ye, niqênîqa qirîkê ye û dike ku bimire.

Ez hêvîdar im ku xebatkarên rojnameyê ji van gazind û lomeyên min neşînin û ji bo xurtkirin û başkirina rojnameya me, van pêşniyazên min bigirin berçav û li ser rawestî. Hevalino li xwe negirin, ez baş dizanim ku rexnegirtin gelek hêsan e, karkirin jî gelek zor û zehmet e û ne karê her keç û lawên baban! Xebat pîvana bawerî û fedakariyê ye! Bila destên we ter bin, lê destên xwe zû bigirin û rojnameyê jî bişînin!

# 'Her dinya li hev dikeve, mezlûm nêzî armancên xwe dibin'

**Nunerê me yê Sûriyeyê JAN DOST bi rewşenbîrê ereb Hadî El Elewî re çavpêketineke hêja di mêjhuya 27. 09. 1996'an de pêk anîbû. Çendî ku çend meh bi ser de bihurîne jî, hevpeyvîne tiştek ji naverok û hêjahiya xwe winda nekiriye.**

**El Elewî bersivên balkêş û "xerîb" dide pirsên Jan Dost.**

**H**adî El-Elewî, ji Iraqê ye. Beşa ekonomiyê kuta kiriyê. Bîst salan li Çînê maye. Lê ew bêhtir li ser kevneşopîya îslamî dixebite Heta niha bi dehan pirtûkên wî çap bûne. Ew dostekî miletê kurd e û doza dewleteke kurdî dike. Bi rastî ew dengê aştiyê yê herî bilind e li nav rewşenbîrên ereb, em karin bibêjin ew Beşikçiyê ereban e.

Dema Helebçe bi gaza xerdelê bombaran bû, wî manifestoyek derxist û xwe ji nasnameya iraqî bîrî kir. Dema min jê re, "Eger kongreyeke dostên miletê kurd çêbe û yê wê Beşikçi hazir bibin hûnê jî hazir bibin?" got, hema ji ser kursiya xwe rabû û got: "Heyran! Ev kongre li ku ye? Ezê hazir bibim."

Li Şamê, li mala wî ya bi wêneyên Che Guevara û Marx xemilandî me ev hevpeyvîn bi erebî pê re çêkir; roja 27.09.1996'an

Wî qebûl nekir ku em fotografê wî bikîşînin.

\*\*\*

Di pêşgotina pirtûka "Dost nîn in jî bilî çiya" de we gotibû ku Partiya Karkeran mûmkûn e bibe partiya hemû kurdan, eger dûriya partiyên din bimeşe, xasma partiya Barzanî û Talabani! Hûn dikarin bêhtir ve gotîna xwe ronî bikin?

Partiyên Kurdistanê Rojhilat (îran) û Kurdistanê Başûr (Iraq) bi derve ve girêdayî ne, serokên wan bûne "mîrên şer" û dev ji doza xwe ya esasî berdane. Piştî şoreşa Xumeynî girêdana kurdên Îranê bi sazîyên împeryalizmê ve kurtir bû. Berê piştgiriya wan nedibû, jî ber ku Îrana Şah di kampa împeryalizmê de bû; Rojava jî, piştewaniya kurdên Iraqê dike, li gorî siyaseta xwe ya dijereban. Ev piştewanî nagihîje sewiyeya qebûlkirina welatekî neteweyî ji kurdan re wekî mafekî. Tenê ew piştewanî dikeve sînorê listikên siyasî ku dikevin bin bandora berjewendiyên împeryalizmê û stratejiya wê ya bilind, eger sozêke rast ji kurdan re hebe.

Ji bo avakirina welatê neteweyî, ne xem e dest bidin hêzeke derve, lê tecrûbeyên kurdan êşkere kirin ku têkiliyên derve bi kurdan re lişkên siyasî ne. Ji ber vê yekê min ew gotin li ser Partiya Karkerên Kurdistanê kir. Ew partî rê-

xistineke şoreşî û serbixwe ye. Li derveyî kampên navneteweyî kar dike û li dijî konlonyalizmê ye û eger li ser vê rêberdewam bike wê bibe çîgirê şoreşa kurdî ya ku bi ser nakeve, eger xwe nespêre miletê kurd bi xwe. Lê Partiya Karkeran kare di vê siyaseta de li ber xwe bide. Ez ji ezman hêvî dikim ku alî wê bike, da ku nekeve rêza wan partiyên din.

*Ji mêj ve, hûn di warê kevneşopîya îslamî de dixebitin, we dîmenê mirovê kurd û bi rengê firehtir dîmenê miletê kurd di vê kevneşopê de çawa dîtin?*

Tu dîmenek di kevneşopîya îslamî de ji miletê kurd re nîn e, kurd bi xwe jî endamên ve kevneşopê ne. Wan jî wekî ereb û ecem û tirkan di vê kevneşo-

**A**ramî di dinya de hêzên serdest e, jî ber ku rewşê wekî xwe dihele. Lê komunîstên Çînê ev durûşm bilind kirin: Tevlîheviyê cihan wergirtiye û rewş dikele. Her ku dinya li hev bikeve, kesên mezlûm nêzî armancên xwe dibin, lê ku aramî çêbe wê zîlm bidome. Dewleta Kurdistanê divê lihevketinê li dijî aramiya emperyalist çêbike.

pê de xebateke mezîn kiriyê. Lê dorî-rehbûna serkêşiyên kurdan û xurtbûna nakokiyên rojane li Kurdistanê tiştên efsaneyî anîne meydanê der heqê wan de. Heta hinekan koka kurdan bi şeytanê ve girê dan, lê ne tiştêkî ilmî (zanistî) bû. Rojekê meleyê Şehrezor hilkişiya ser menberê û xwend: "El ekradû eşeddû kufren we nifaqên." Ango kurd bêhtir kafir û minafiq in. Yek ji haziran rabû û got: "Ayeta Quranê ne wisa ye, ayet dibêje: (El erab eşeddû...hwd.) Mele rabû got: "Xwedê daneke tiye Şehrezorê ku bibîne kurd çî dikin!"

Ev tişt pêkenoke bêhtir ku raman û fikir be. Yê ku jêderên îslamî baş bixwîne û guh nede hin deqên (tekstên) ji vir û wir, wê bêhtir rêzgirtin û hurmeta kurdan bibîne. Dîroknivîsan qala hinek mîrên Kurdistanê bi seymayî kirine û hunerên wan tomar (qeyd) kirine. Dev jî avêtine hinekan -wekî her kesê din her yek li gorî kirin û hunerên wan edeba îslamî, lehengiya kurdan di şerên Selîbî de aniye ziman. Mesela, di vê

malikê de şairek pesnê sê miletên îslamî dike, ku li hemberî xaçperestan şer kirine.

*Te bela anîne serê rûm û frengan  
Bi destê kurd û ereb û tirkan.*

Heta niha ez li helbestên ku dev bi-avêjin kurdan, rast nehatime, lê gelek helbest hene ku dev diavêjin tirk û ereb û eceman û wekî xwendevan û lêkolînerên edeba erebî ya îslamî zanin, ku gelekî devavêtina ereban di wê edebiyatê de heye.

Ew dîmenê ku pîrsa we behsa wê dike, rojhilatnas dixwazin çêkin, bi spartina bal çend xêzikan. Hinek netewekarên ereb jê feydê jî dibînin, xasma ew nivîsên ku dibêjin kurd bi eslê xwe ereb in. Ew nivîs jî ji cem hinek dîroknivîsan hatiye, dema xwestine lêkolînan li ser koka tişt û navan çêkin û tu armanceke wan ya siyasî tune bû, jî ber ku wê demê qewmîyet (miletperwerî, netewekarî) hîn nehatibû meydanê, netewekariya ku ji berhemên (encamcên) fikara nûjen a Ewrûpayê ye.

*Hin sewiyeyên cihêreng di nêrîna*

*rewşenbîrên ereb de hene der barê doza kurdî û dozên neteweyî de. Hûn van sewiyeyên cihêreng çawa dinirxînin?*

Rewşenbîrê ereb ê ne iraqî, dijmintiya doza (pîrsa) kurdayetiye dike, ev gotin li ser çepên ereb jî rast tê, ne tenê netewekarên ereb.

Siyasetnedar û rewşenbîrên ereb, li kurdên iraqê dîmerin wekî kêmiyêke neteweyî, ne ku parçeyêke ji miletekî mezîn. Ev nêrîna "pêşverû" û çepgirên ereban e. Lê netewekar dibêjin ku kurd ereb in, bi kurdî dipeyivin û zimanê kurdî bi xwe jî jî yê erebî hatiye girtin. Netewekarekî ereb carekê ji min re got: "Kurd birayên me ne." Min got: "Erê. Ji ber ku ew ereb in ne?" Ev armanca wî bû.

Li hêviya sedeqa (xêra) tu kesî nemînin. Heq û maf, tenê bi zorê tê û wekî hev e eger rewşenbîrê ereb piştgiriya we kir an jî dijberiya we kir. Ew nikare tiştêkî ji we re bike û nikare nehêle ku hûn mafê xwe bistînin. Ew nikare tiştêkî ji xwe re bike, wê çawa jî yê xeynî xwe re bike!

*We projeya ferhengeke mezîn daye ber xwe û li gorî ku min bihîst hûn nav lê dikin projeya temen (emir). Gelo çiyê kurdan di vê projeyê de heye?!*

Îşê kurdan bi projeya min a ferhengî nîn e. Ew jî bo zimanê erebî ye û dixwaze astengên zimanê lêkolînan peyven zanistî çareser bike. Ev jî ji bo ereban e, ne ji bo kurdan. Lê em dikarin bibêjin xwediyê vê ferhengê erebêkî esil e û dostekî miletê kurd e û dibêje Kurdistanê Başûr xakekî dagirkirî ye. Eynî wekî Filistinê ye. Ev jî tesadûfek e. Dibe ku nivîskarekî ferhengeke di nijadperestekî ereb be û erebtîya Kurdistanê muhitir bibîne ji erebtîya Filistinê.

*Niha em wekî xelkên Rojhilat li ber êrişêke Rojava ya herî mezîn in û di her mecalê de. Hêja ye ez bibêjim ev êriş an têkbirin jî zemanê Îskender ve û heya beriya wî jî. Di raya we de çawa emê pêşberiya Rojava bikin? Gelo em xwe bisiperin kevneşopîya Rojhilat (Şerqê) ya rûhî û sinc û nirxên wê an jî bi çek û silahên Rojava bi xwe; angî bi zanistî û hêzên teknîkî an bi çî? Hûn rewşa pêşerojê xweş dibînin?*

Têkbirin û êrişê Rojava jî zemanê Îskender ve ye, li hemberî wê, me jî êriş dibir ser Rojava. Eceman ew êriş kirin. Pişt re Îskender hat. Rûm hatin, Hanîbal şerê wan kir. Pişt re Zenubya, dawî Omer kurê Xettab ê ku ew ber bi welatê wan de kişandin. Mislimanan êriş birin ser Îspanyayê, Îtalya û Fransayê. Selîbî (xaçparêz) hatin êrişî me kirin. Osmanîyan jî êrişê Rojava kir. Pişt re Îngilîz û Fransîz hatin Rojhilat û niha jî amerîkî.

Her car me pêşberiya Rojava bi mendîniyet û şarîstaniyê dikir. Şarîstaniyên wekî Qartaja. Tedmur (Palmêra), pişt re îslam. Ereben berî îslamê (cahiliyan) nikaribûn li hemberî rûmanan rabîn, jî ber ku ne xwedî şarîstaniyê (sivîlizasyon) bûn. Ev tê wateya ku pêşberiya êrişkeran muhtacî hilbûnekê û pêşveçûnekê civakî û ekonomî ye. Em jî di vê yekê de bi ser neketin, heta niha. Bi sebebê paşketina me, miletên Rojhilata Dûr (Çîn-Japon) ew jî bi ser neketin.

Paşketina me hişt Rojava bêhtir kûr herin û serdestiya me bikin, bêyî ku tiştêkî pir deynin, jî ber ku wan dît gelek jî me amade ne ji bo xizmeta wan. Niha ajan û sîxurên Rojava di hikumdariyê de, di dijberiyê de, di çandê û di dîn de hene, angî di her aliyê jiyanan me ya ku siyasatvan û rewşenbîr wê îdare



dikin de.

Tenê Cemawer (piraniya xelkê) xwedî fêhmeke welatarêzî û civakî ye ku pê li hemberî êrîşa Rojava radiwestin û eger cemawer li ser vê helwestê nemabûna, wê kolonyalîzma Rojava her û her mabûya û me nedikarî pêşberiya wan bikira. Ev jî rastiyeke e ku rojavayî tê digihên, ji ber vî awayî êrîşa xwe ya nû bi medyayê dikin û di malên xelkên me de êrîşî mêjî û dilê wan dikin. Lê ez bawer nakim ku wê ew zû bi zû bi ser bikevin.

Niha malzameyên (wesayîten) berxwedanê li ba me hene. Ji bo parastina gel ji êrîşa medyayî. Bi çî awayî be em muhtacî televîzyonê ne ji bo pêşberiya televîzyona li dijî me. Lê mixabin ev ne di destê me de ye, em yê welatparêzên dijber. Lê di destên hikûmetan de ne ku ew jî saziyên Rojava ne. Ev hikûmet parçeyek in ji civaka navneteweyî û televîzyonên wan beşek in ji împêratoriya medyaya Rojava. Naçer e, divê em televîzyonan bi dest bixînin da ku bigihên mîlet. Ji ber ku çapemenî têra pêşberiyê nake.

Eger kanaleke televîzyonê her hefte yek saet bida min ji bo axaftinê, an her mehekê, minê êrîşa Rojava li singa xwediyê wê veşerand. Lê kanalên televîzyonên fermî tevde di destê tabûra pêncan de ye. Ewên ku fikr û fêhm û meslekpîs in.

Gotina we li ser kevneşopa Rojhilat ya rûhî û sinc û nîrxên Rojhilat gelekî mijokî ne, şaristaniya Rojhilat rûyekî wê ya mirovayeti (humanizm) heye. Zanyarên Rojava di lêkolînên der barî vî şanistanyê de uslûbên pîs (xebîs) meşandin. Ev xuyakirin, wekî berhemke mîtolojîk û efsaneyî û bi vî rengî xwe berdane mêjiyê rewşenbîr û siyasetvanên me û ew kirin şagirt û ajanên fikr û tarîxa Rojava. Vê yekê tesîreke ne baş (neyînî) li tevgera rizgariya neteweyî û civakî kir. Ji ber ku gelek ji serokên vî tevgerê bi çanda Rojava perwerde bûne û ji çanda xwe ya esasî qut bûne. Û wiha me dît. Partî û kesên netewekar di çerxa Rojava de dizivirin û çepgirên me jî sosyalîzm kevneşopeke ewrûpî hesabandin.

Îcar Ewropa (ya ku kesên netewekar fêr kir çawa mîletên xwe teslîmî wê bikin) bû jêderka îlhama çepgirên me. Ev çepgirên ku tiştêkî ji dîroka xwe, ji kevneşopa xwe, ji derdora xwe, ji cemawerên xwe û hestên wan nizanin... Kesên netewekar karibûn dewletên nivbîndest çêkin û li şûna kolonyalîsta Rojavayî wan hukum bikin. Lê hêzên çepgir nikaribûn rejîmên sosyalîst ava bikin. Ji ber ku wan xwe spart nuxxeya wergerandî ya sosyalîzmê, tenê Çînî bi serketin, wan bêhtir ji xeyrî xwe kevneşopa xwe ya komunist nas kir û tev li îdeolojîya ekonomîya marksîzmê kirin û ew nimûneya gewre ya komünîzmê ava kirin.

Komünîstên navçeya (herêma) me ereb, kurd tirk, ecem nebaştirîn nîfşî û celebên komünîstan bûn. Ji ber mêjiyê herî talanbûyî bû û ew şagirtên jêdera

ewrûpî bûn. Gotina we jî, ji vî rewşa ne mulayîm e (qesta H. El Elewî gotina min a li ser kevneşopa Rojhilata rûhî ye). Divê em bi şeweyekî din vî pîrsê bînin ziman, da ku kevneşopa Rojhilat a humanîst têkeve xizmeta tevcrûbeyên ku em dixwazin bikin piştî hilweşandina komünîzma wergerandî.

*Baş e. Îcar emê bi çî rengî li hemberî Rojava rabin?*



**E**reb kurdan dikin ereb, tirk wan dikin tirk û faris wan dikin faris. Heta yê ku piştî riya doza kurdî dikin di nav van mîletan de, hê nanîhêrin wekî doza mîletekî parçebûyî û ji welatê xwe mehrûn. Lê ew jî wê doze dinîhêrin wekî doza komariyêke etnî (qawmî) û piştî riya wê dikin di nav sinorên dewletên xwe de.

Emê bi ser bikevin. Dema ku em xwe bispêrin tevrabûneke zanistî û di gel rastiyan me yê dîrokî û civatên me yê îro û tevrabûna me girêdayî bi komünîzmê ve be. Ji ber ku rewşa kolonyalî ya dewletên me nahêle welatên me li ser esasekî kapîtalîst bi pêş bikevin û mîletên me yê xwedî kevneşopeke komünî (meşal) (komünîzma însanên şkeftan... J.Dost) pêşveçûneke kapîtalîst qebûl nakin. Ev jî rastiyeke e.

Serokê komünîzma nû li Rûsyayê Ginadi Ziyoganofov bala xwe dayê ku planên Yeltsin di kapîtalkirina Rûsyayê de bi ser nakevin. Ji ber ku gelê rûs ge-

lekî komünî ye berî her tiştî (li kitêba wî ya pêwîst binêre: Rûsya li hemberî cihana nûdem). Bi ci halî be, divê em du merhaleyên pêşberiyê ji hev cuda bikin. Merhaleya berxwedanê û ya hikumdariyê; niha em di merhaleya berxwedanê de ne. Di vî merhaleyê de jî em nikarin ilm û teknolojiya nûjen bi kar bînin. Di pêşberiya xwe de, ji ber ku hikum ne di destê me de ye, lê malzemyên berxwedanê yê din hene. Tê-

ziyanên di leşkeran de (kuştina leşkerên xwe) tehemûl nakin. Şerê rû li rû (mubaşer) nikarin bikin, îcar dest diavêjin şerên wekaletê. Wekî şerê Baasa Iraqê li dijî Îranê, an jî bombekirina ji dûr ve ku ziyar li wan nebe. Şerê gelêrî ziyaneke pir digihîne leşkerên rojavayî yê ku nikarin xwe biparêzin, bi roket û balafiran ewê ku ziyaneke digihînin sîvilan tenê bîyî ku tesîrê li şervanên gelêrî (gerîla) bikin. Ji ber ku gerîla dizanin xwe baş veşirin.

Delîlê dawî jî şerê Amerîkayê li Lubnanê, bi sedan sîvil hatin kuştin û birîndar bûn û ne bêhtirî deh şervan şehîd bûn. Artêşa îsraîl û DYA (USA) newêrîbûn daketana erdê û biketana şer; bi şervanên gelêrî re. Ev tişt di şerê li dijî Iraqê de jî çêbû. Rojavayîyan tenê ji dûr bombe dikin û şerekî tenê bi Artêşa Iraqê re kirin û dawî şer rawestiya.

Em dikarin mêtîngerên rojavayî di şer de bişikînin û li ba mîletên me taqetên tekoşinê yê bêsînor hene. Lê ev tekoşin bi pêş nakeve, ji ber xerab-bûna seroketîyan û tîrsa wan. Ew nikarin bigihîjin sewiyeya cemawer. Di vir de problemek derdikeve pêş kurdan. Ji ber ku ev ne şerê Rojava, lê şerê tirk û ecem û ereban dikin û ev jî ziyarên di kewan de, ne xema wan e. Û wisa şer dûdirêj dibe.

Ev şerê gelêrî yê dûdirêj ku gelê Çînê bi serokatiya komünîstan li dijî komîntang kir, sî salî dirêj kir.


Kurd ji demeke bêhtir vî şerî dikin, lê ew bi ser neketin. Ji ber xayintîya serokatiyên xwe. Lê li Çînê serokên şarezaya hebûn kevneşopa mîletê xwe yê kevnar fêm kirin û temsîl kirin. Merhaleya dî, di pêşberiya Rojava de ne hêsantir e ji ya şerê rizgariyê û mîletên Rojhilat yê ji mêtîngeriyeke rizgar bûn. Nikaribûn civakên xwe bi pêş bixin. Ji ber ku serokên wan mîletan girêdayî bûn bi mêtîngeran ve, wekî çawa li welatê ereban. Serokan ew welat kirin ci-hê destdirêjiya mêtîngeran. Eger serokên welatên rizgarbûyî netewekar bin wê pêşveçûnîya xwe bêkelem biajo. Rizgarbûna siyasî ya bi temamî di serî de tê ji bo pêşxistinê.

Serok (hakim) kêfxweşiya xwe di pêşketin welatan de dibînin, ne di komkirina pereyên di bankayan de û talankirina malê mîlet û civandina cêriyan û mirina bi ser xwarin û vexwarinê de. Wekî em niha dibînin.

*Hûn rewşa marksîzmê îro û di pêş de çawa dibînin, xasma piştî wan hilweşinan?*

Ev pîrseke mezin e. Yê ku dixwaze bersiva wê bide, divê berî her tiştî bibe Marks û Lenîn! Ez jî, ji min re ne pêwîst e pêşeroja xelkê. Bes em di encam û dawîya xwe de bifikirin (em xelkên vî navçeyê) marksîzm berî her kesî ji bo me muhîm e û wekî çawa Semîr Emîn digot, ew bûye ji pêwîstî û pêdiviyên serhildana me û eger Semîr Emîn ji vî gotina xwe vegeşîya ew îşê wî ye.

# Zêmara li ser Şehîd Merwan



Ev zêmara (axita) ku ÇIYA MAZÎ ji zardevê dayika Şehîd Merwan (Aydin Adsay) girtiye, em jî pêşkêşî we xwendevanên hêja dikin.

Şervanên Welatê Rojê di govenda serxwebûn û azadiyê de

Ez çûme Amedê li te geriyam  
Li ber bedenê li ber deriyan  
Min tu nedîtî egîdê mino.

Yekî got ji min re; li Deriyê Ruhayê ye  
Yekî got ji min re; li Deriyê Serayê ye  
Yekî got ji min re; li Benûsenê ye  
Ez geriyam jinek bi tenê  
Min tu nedîtî egîdê mino.

Merwanê min tu kurê min î  
Tu hesreta ber dilê min î  
Ez te nadim bi malê dinê  
Xwe rê min bide carek bi tenê  
Min bêriya te kiriye Merwanê mino.

Ez çûm Mêrdînê berikî dîz e  
Pozê kelê bi ser da xûz e  
Dîsa mij e, dîsa xunav e

Ez dipirsim kes şanî min nade  
Ha li vî gundî, ha li wî gundî  
Kes nabê jî min re min Merwanê te di  
Tu bi ku de çiyî Merwanê mino

Birkenexşê bi hesreta te  
Geliyê Qazaxê û çayê Manê  
Giş bi kalekal mane li benda te

Tu cih û deverê Mazîdax nemabû  
Te lê nedilist û cirvît nedabû  
Bêhna te dixwazim şervanê mino.

Te dibistan xwend bi spas û îftixara  
Ka tê bibûyû dixor ji dayika xwe ra  
De were ez nexweşim dixorê mino.

Delalê min te digot: Ez çûm menale  
Ji ber ku gelê me pirî bêhale  
Tu winda bûyî ne cih û ne war e  
Çi bikim kurê min mame bêcare  
De were lawo, rêzanê mino.

Tu fermandarê nav artêşan bûyî  
Tu serkêşê koma şervanan bûyî  
Tu rêveberê partiyan bûyî  
Tu ji bo welat pir hêja bûyî  
Û li ber dilê min Aydinê mino.

Dibêjin alaya romê cerdî Başûr kir  
Tu jî tê da bûyî qey bi çek û tiving  
Tu li hemberî topan xweş sekinîbû  
Dilê dayika te bi him û gum bû  
Qey zinar bû şervanê mino.

Min agahiyên te timî dibihîst  
Ha li wî şerî, ha li wê cerdê

Lê min tu nedîtî li rûyê erdê  
Qey tu firiyayî teyrikê mino.

Ez çûm Cizîrê, li benda te mam  
Ji min re negotin ne dot û ne mam  
Çemê Dîcleyê xwîn diherikî  
Birca Belek rûyê xwe diguherî  
Çiyayê Bagok, Çiyayê Cûdî

Çirok digotin neviyên Cizîri  
Dengê helbestên Ehmedê Xanî  
Bêhna te dihat ji Çiyayê Gabarî  
Lê min tu nedîtî pêlewanê mino.

Cergî tu winda bûyî ji ber çavên min  
Hisreta min e carekê te bibinim  
Bi şev dinalim, bi roj dikalim  
Hêsirê min jî neman çûçikê mino

Ez çûm warê Rizo, warê Şex Seîd  
Min gelek şervanên wekî te dît  
Lê min tu ne dît, lê min tu nedît  
Qey çavên min tarî bûne reşika mino.

Min ji şervanan re got:  
Kanî Merwanê min, kanî egîdê min?  
Gotin: Yadê va ye em giş Merwan in  
Dilê min xweş bû bi qehremanan

Giş tematîk bûn Merwanê mino.

Çiya û newal, gelî û zevî  
Tevde bûne Merwan hemû dibezin  
Ji ber çavên min çavên dayika te  
Bi hezaran xort way tene tola te  
Ez nema digirîm li dûv şopa te  
Ezê li exretê bême hinda te  
Min ji bir neke melekê mino.

Bibihîzin çiyano, bibihîzin darno  
Dengê min tê we şervano, egîdno  
Dilê dayika we wekî yê min e  
Hemû bi kul û bi keser û xwîn e  
Şîrê ku we xwariye li xwe helal kin  
Jiyaneke baş ji me re ava kin  
Êdî hûn giş Merwanên mino.

Ey melekno bibihîzin..  
Guneh ji wî re nenivîsin  
Balîfa hevrîşim li bin serî deynin  
Ew şehîdê Kurdistan e,  
Ew delalîkê ber dilê mino.

Ey mirovno, li min guhdar kin  
Perdeya ser çavên xwe rakin  
Cilê namûsê bi ser xwe da kin  
Ji bo we şehîd bû Aydinê mino.



Li navendên çandê çalakiyê: vê heftayê

Li NÇM'ya Stenbolê

● 16.02.97 **Yekşem**: Konsera Koma Amed, saet: 14.00

Şanoya Hêlîn: Bayê Elegezê, saet: 17.30

● 19.02.97 **Çarşem**: Semînera Ismail Gölbaş bi sernavê "Kemalizm

û Pirsgirêka Kurd", saet: 17.30

● 21.02.97 **În**: Fîlm: Isa, saet: 18.00

● 22.02.97 **Şemî**: Konsera Koroya NÇM'ê, saet: 14.00

Şanoya Hêlîn: Bayê Elegezê, saet: 17.30

Li NÇM'ya İzmir'ê

● 16.02.97 **Yekşem**: Konser: Rûzgarla gelen, saet: 17.00

● 19.02.97 **Çarşem**: Konferansa li ser Pergala Cihanê ya Nû, Tirk û Pirsgirêka Kurdan, pêşkêş: Haluk Gerger, saet: 18.00

● 22.02.97 **Şemî**: Konsera Koma Dengê Azadî, saet: 17.30

Li BEKSAV'ê

● 22.02.97 **Şemî**: Pêşengeha li "Rastiya Îdamê û Îdamên Polîtîk"

Panel: Ji Susurluk Heta Rêveberiya Krîzê ya Navendî

Prof Dr. Mehmet Altan (nivîskar)

Ismail Sanoğlu (Endemê Komîteya Rêveber ê Navenda IHD'ê)

Hacı Orman (Rojnameger), saet: 13.30

Sohbêta Ahmet Soner li ser fîlmê belgewartî "Edene-Paris", saet: 18.30

## RÛDAN

# Analîzên balkêş li ser tevgera çepgir



**Ertuğrul Kürkçü, li Navenda Çanda Mezopotamyayê panelek da. Kürkçü li ser rêxistinên komunîst, demokrasiya burjuvazî, faşîzmê û li ser karkerên cihanê, bi taybetî jî yên Sovyet û Ewrûpayî hin analîz kirin.**

Ertuğrul Kürkçü, roja çarşemê (12'ê reşemiyê) Navenda Çanda Mezopotamyayê panelek da. Mijar, 'Şerê Navxweyî yê Îspanyayê' bû. Lê ji ber ku Kürkçü li derxa xwe baş nexebitîbû mijar guherî. Êdî li ser rêxistinên komunîst, demokrasiya burjuvazî, faşîzmê û li ser karkerên cihanê, bi taybetî jî yên Sovyet û Ewrûpayî hin analîz kirin.

Ertuğrul Kürkçü di despêkê de li ser sedemên şerê Îspanya bi kurtayî rawestiya û da zanîn ku şerê navxweyî yê Îspanyayê, bi zêdeyî jî ber îtifaka çepgir û komarparêzan derketiye. Yanê eniya gel, gelek pirsgirêk û astengî bi xwe re anîne. Wî got ku, ev şer ji bo çepgirên dinyayê bi dersan tijî ye. Çepgirên dinyayê li ser vê mijarê pir gengeşî kirin, hê jî dikin. Yek ji xalên gengeşiyê ya girîng jî 'di têkoşîna li dijî faşîzmê de taktîka eniya yekbûyî bû. Kürkçü diyar kir ku partiyên komunîst ên Ewrûpayê, ji sala 1920'an heta 1930'î li hemû cihanê partiyên şoreşger di nav Komunîst Enternasyonalê de bûn. Kürkçü, rola girîng ê îdelogên partiyên komunîst û teorîsyenên sovyet û yên din jî daxuyand û got: "Teorîsyenên partiyên komunîst yek du kes ne tê de (wekî Troçkî, Clara Zetkin, Antonio Gramsci) di navbera faşîzm û sosyal demokrasiyê de tu cudahî neditin."

Kürkçü li ser kongreya Komunîst Enternasyonal (1928) a şeşan jî, got ku li hemû cihanê

bayê şoreşê belav bûbû. Piştî kongreya Komunîst Enternasyonalê ya 6'an wekî reaksiyona burjuvazî li hemberî tevgera komunîst, faşîzm xurt bû. Di navbera tevgerên karkeran de dubendî û nakokî hatin afirandin. Yanê milê sosyal demokrat û milê şoreşger ji hev veqetiyan. Jixwe taktîka Komunîst Enternasyonalê ya tûj jî alikariya vê yekê kir. Li gorî vê taktîkê kesê ku ne endamê sendikayên sor bû, wekî aligirê faşîzmê dihat dîtin.


Nivîskar û rojnamevanê tirk Ertuğrul Kürkçü paşê gotina xwe anî ser Kurdistanê. Wî da zanîn ku ji rewşa îroyîn a Kurdistanê împeryalist berpirs in. Wî got: "Her tim împeryalizmê xwestiye li ser axa gelên bindest bi riya polîtîkayên asîmilasyonê desthilatdariya xwe xurtir bike. Wisa hate dîtin ku li Kurdistanê nikaribûn bingeha vê polîtîkayê ava bikin. Şertên ku vê polîtîkayê bikar bînin nîn bû. Li gorî polîtîkaya kedxweran gund şewitandin, mirov infazkirin, çavê gel tirsandin, riyên şikandina tevgera gel in. Ew dixwazin bi koçberiyê jî mirovan bikişînin metropolan ku li wir wan ji aliyê çandî ve asîmîle bikin."

Panel bi pirsên beşdarên qediya, li dora 150 kesî beşdarî panelê bû.

A. ZÊR

## TÎŞK

BEKIR BAHOZ



## Amed û birsêti

**K**atêk ke çend roj lemewber le telefizyonekanî cihan û Tirkiya we, temaşay dîmenî diltezênî awarekanî şarî Amed im dekirî, awarebûnî gelî başûrî Kurdistanî im hatewe yad ke diway raperînî 1991, nawar bû rû le sinûrî beşekanî dî Kurdistan bikat.

Dewlemendêkî şarî Amed be boney mangî Remezanewe barî çend lorî xwardemenî kirîbû bo ewey be ser aware û hejarekanî Amed da dabeş bikrêt. Belam dayerey şerî taybetî dewletî Tirkiya hewlî da ew hele biqozêtewe û be ray nawxoy, Tirkiya û cihanî biselmênêt ke kêşay kurd le bakûrî Kurdistan kêşeyekî abûrî ye, nek kêşeyekî siyasî. Eme le katêk da ke Tirkiye dexwazê ew rastiye bişarêtewe ke şarî Amed nîw mily-on gundnîşînî bakûrî Kurdistan le xo degrêt ke hemûyan be hoy sûtandin û wêrankirdinî gundekanyanewe aware bûne.

Helbet le kes şarawe niye ke boçî le bakûrî Kurdistan gund desûtên û gundnîşîn aware û derberder debin. Tewaw 13 sal e ke dewletî Tirkiya şerêkî çepel dij be gelî bakûrî Kurdistan û diwatirîş le hemû Kurdistanî gewere.

Çawdêrî siyasî baş dezanê ke şarî Amed nawendêkî le ber çawî şerî çepelî dij be gelî kurd e, Tirkiyaş her hew boçûnewe hewl dedat serincî ray giştî nawxo û derew rabikêşete ser û le rewayî û dirûstî kêşay kurd kem bikatewe û le qalibî kêşeykî abûrî yan mirovayeti bidat.

Em reftarey dewletî Tirkiya le katêk da dêt ke heman Tirkiye hêzekanî başûrî Kurdistan dênête Enqere û tê dekoşet dij be Partî Kirêkaranî Kurdistan PKK rêkiyan bixat, bo ewey le rêy ewanewe bigat be amance gilawekanî û eger boy bikrêt destêk le xebatî rizgarî xwazî gelî Kurdistan biweşênêt. Bo ew mebeste, Tirkiya ajan û sîxurekanî xoy le jêr perdey mangî sûhi Turkiya da be şeqkirdinî rîzekanî gelî kurd da le başûrî Kurdistan.

Baş e eger Tirkiya ewende be teng kurdewe dêt û hawkarî gelî başûrî Kurdistan dekat, boçî le heman kat da dest helnagrêt le bakûrî Kurdistan û diwayî nahênêt be şer. Bêguman eger şerî taybet dij be gelî kurd berpa nekrêt û şar û gund û kêlge û cêy bab û bapîrî wêran nekrêt, be hiç şeweyek aware nabêt û rû le şarekan nakat ke aware nebû û rûy le şarekanîş nakird, dîmenî diltezênî wek dîmekanî şarî Amed le dayik nabin.

# Hirça mêvanperwer

Ev helbesta hanê ji me re  
bênav hatiye şandin.  
Em jî nizanin ku ev helbest a  
kê ye an jî ji aliyê kê ve  
hatiye berhevkirin.  
Em vê çîroka helbestî bênav  
diweşînin.

Bû çile, baran barî  
Dinya bû reş û tarî  
Ba û bahoz tev rabû  
Mala rovî xera bû

Destpêka çilê dirêj  
Serî li rovî kir gêj  
Zivistanek pirî sar  
Ne man heye ne star

Rovî gelek geriya  
Roj bi roj ji birçîna heliya  
Rabû çû mala hirçê  
Hundur weke bihiştê.

Got: Hirçê bixapînim  
Çile li vir bimînim.  
Wexta hirçê rovî dî  
Çav lê çûn nava serî.

Hirçê got: Biqêste here  
Cihekî bibîn ji xwe re.

Rovî got: Zûde ez li vir im  
Hatim bi te bişewirim.

Wexta rovî wiha got  
Dilê hirçê bû pizot  
Hirçê destûr da rovî.  
Gotê: Tu çi mirovî.

Wî ferman da çûn hundir  
Rovî rûnişt li miqabil  
Çend heb jî şîretên kûr  
Ji bo min derxe ji tûr.

Rovî got: Dema ku ez hatim  
Rastî gomekê hatim  
Ew gom nêzikî vir e  
Hawîrdor tev kevir e.



Îsal zivistan sar e  
Piştî min anî xwar e  
Ji ber ez bê xanî me  
Bê qût û bê xwedî me

Dema ez xwedî mal bûm  
Xwedî dost û heval bûm  
Ger tu destûr bidî min  
Rojê pezek li ser min.

Rovî kire behsa pez  
Hirçê zimanê xwe digez  
Got: Ez dibêjim ji can

Li cem min bibe mêvan

Rovî li hundur çû û hat  
Dît ku tev hingiv û zad

Wê qûtê xwe yê salê  
Daniye paşya malê

Kom kiriye hingivê dara  
Tev xistiye kewara  
Rojek ji sibehek sar  
Rovî û hirçê taştê xwar.

Rovî got: Ezê rabim herim  
Li dora gomê bigerim  
Dikim ez herim rêyek dûr  
Hinek hingiv bixe tûr.

Rovî xwe amade kir  
Tûrik li milê xwe kir  
Rabû da hevraz û çû jor  
Rûnişt li bin tahta sor.

Raza heta bû êvar  
Daket ser rê hate mal  
Hirçê got: Kanî mêşin  
Te digot; emê bibrêjin.

Îro serma pir hebû  
Pez ji hev bela nebû  
Rovî bi vir û fena  
Çend mehan li wê dê ma.

Ewî hingiv tevde xwar  
Heta li xwe kir bihar  
Rovî rojkê zû hat mal  
Bi hêrs pal da ser dîwar.

Hirçê pirsî: Qey çi bû?  
Rovî got: Pez ji wir çû,  
Lê min dît li bin tahta sor  
Tijeye hingivê kilor.

Îcar kanî bi min re wer  
Em herin wî bînin der  
Rovî hirç hilkişand jor  
Ew anî ser tahta sor.


Hirçê got: Dîno rovî,  
Nizanim tu çi mirovî,  
Li bin vê berqefa kûr  
Çawa hingiv bixim tûr?!

Ev mêşên hingiv ên har  
Wê can li min bikin xar  
Her du bi hev re mijûl bûn  
Hatin ser zinarê wek stûn.

Rovî dahfek da hirçê  
Ji jor de ket ser piştê  
Hirç ket û nema rabû  
Rovî bi kêf û şa bû.

Çi xizanbû hirça zar  
Ji zinar de hate xwar  
Rovî daket ser hirçê  
Got: Tu dê rast herî bihiştê.

# Di şanonivîsîna kurdî de berhemeke nû



**M**in divêt bi hevokerê mamosta Medenî Ferho yî ya li ser nave-roka pirtûkê û hest û baweriya nivîskarê pirtûkê dest bi danasîna pirtûkê bikim. Medenî Ferho di pêşgotina xwe de, der barê nivîskar de wisa dibêje: "Yek ji van bilbizêka pirtûka Abbas M. Abbas e ku hespên bayî û quloçê conegayê Zeus bi hev sar kirin û bi zimanê şevrev banga xwe kir û got: 'Kanî gurzê Ristemê Zal?...' Ne got "Dadmafiya Zeus li ku derê ye?"

Di vê hevoka Medenî Ferho de, bo me xweş diyar dibe ku nivîskarê pirtûkê mirovêkî zor pêjinker e û rewşa gelê kurd a ku îro tê re derbas dibe û rewşa şoreşê bi hûrbîni aniyê zimên.

Nivîskarê pirtûka Şevên Zivistanî û Melekî Tawus Abbas M. Abbas, xelkê Başûrê biçûk ê Kurdistanê ye. Li gorî nivîsîna paşbergê pirtûkê, Abbas M. Abbas xwendina xwe bi zimanê erebî kiriye û berî nivîsîna bi zimanê kurdî, gelek çîrok û helbestên xwe bi zimanê erebî

nivîsîne. Ev pirtûka wî ya şanoyî ku ji pênc leyistikên dirêj pêk hatiye, li jêr navên Şevên Zivistanî û Melekî Tawus, Kewê Koçber, Pêşmergê Biçûk, Cengo, Xecê hatiye amadekirin û bi pêşgotina Mamosta Medenî Ferho hatiye xemilandin û di sala 1996'an de li Almaniyayê li bajarê Aachenê hatiye weşandin.

Nivîskar Abbas M. Abbas di yekeymîn leyistika şanoya xwe de ya ku ji çar perdeyan pêk hatiye, li ser zilm û zordariya cendirmeyên tirkan a ku li gelê kurd dikin û li ser koçberiya kurdan ji ber vê zilm û zordariya tirkan û di nav vê zilm û zordariyê û koçberiyê de, li ser têkiliyên di navbera kurdên êzîdî û yên misilman de û li ser xebat û alikariya Heywa Sora Kurdistanê radiweste.

Di leyistika duwemîn de ya ku ji neh perdeyan pêk hatiye, rewşa xêzaneke (malbat) hejarî kurd ku çawa ji neçarî û ji nezaniya xwe nêzîkahiye li dijminê xwe dikin, bi zimanekî vekirî daye xuyakirin. Belê gava ku ev xêzan li xwe hay dikevin, vê çare fedakariya wan a di ber rûmet û azadiya welat de aniyê zimên.

Di sêyemîn leyistika şanoya xwe de ku ji sê perdeyan pêk hatiye, nivîskar li ser jiyana û daxwaza zarokêkî biçûk ku bêriya bavê xwe yê gerîla dike, rawestiyaye.

Di çaremîn leyistika li jêr navê Cengo de ji ku ji şeş perdeyan pêk hatiye, li ser rewşa zarokêkî ku belavkarê rojnemeya Özgür Gündemê ye û bavê wî şehîd bûye, radiweste.

Û di pêncemîn leyistika ku ji şeş perdeyan pêk hatiye de jî, ew li ser rewşa ji-

na kurd û rola wê ya di şoreşê de rawestiyaye.

Belê, em dikarin bi dilxweşî bibêjin ku Abbas M. Abbas bi van pênc şanoyên ku nivîsîna berhemeke berbiçav daye. Piştî vê kurte daxuyakirinê ez dixwazim bibêjim ku nivîskar Abbas M. Abbas, tenê devokê herêma xwe di nivîsa xwe de bi kar aniyê. Digel ku bûyer li deverên ditirî Kurdistanê rûdane jî. Ji ber vê yekê jî bikaranîna devokê herêmî û devera rûdanê li hev nekirine.

Bo nimûne, di leyistika Şevên Zivistanê û Melekî Tawus de koçberî li devera Şimex rûdide. Wekî tê zanîn ku ev dever bi devokê botanî yê herî nazik dipeyivin. Belê Abbas M. Abbas, dan û standina bi hev re ya mirovên vê deverê bi devokê torî aniyê zimên. Helbet pêkanîna çîrok, çîrçîrok û nivîsên şanoyan bi taybetî, li gorî devokê devera ku bûyer lê rûdide bê çawa tişteki durist e, bikaranîna devokê herêmekê jî bo herêmeke ditir ew qasî ne durist e. Ez di wê baweriyê de me ku nivîskarê hejra Abbas M. Abbas jî wê vê nêrinê rewşa bibîne.

Bêguman her kurdekî welatperwer di wê baweriyê de ye ku ji hemû layan ve (helbest, çîrok, roman, pexşan şano û yên mayî) şoreşa kurdî divêt bê nivîsîn. Belê pêdiviyê ev nivîsînê han di wî astî de bin ku karibin bersiva demê bidin û daxwaza gel bicih binin. Pêkanîna berheman bi çend gotinên tûj û sloganîk nebes e. Di baweriyê min de zimanê kurdî jî bo pêkanîna van berheman bi payebilindî tere dike. Bes ku yê nivîskar hinekî xwe biwestîne!

DILDAR ŞEKO

## Jiyana Rewşen

Di hefteya rabûrî de pêncemîn hejmarê kovara Jiyana Rewşen a mehane ku ji 64 rûpelan pêk hatiye, digel gelek nivîskar û nivîsên xwe yên cihê-reng derket pêşberî xwendevanên xwe.

Bi kurtayî, divêt bê xuyakirin ku ev hejmara Jiyana Rewşen, digel hebûna hinek babetên heja ji qelemên wekî Hesen Zinar 'Çiroknivîsîna dinê û Helîm Yûsiv', F.Hüseyn Sagnîç 'Wêje û Ehemedê Xanî', Helîm Yûsiv 'Jinenîgariya Solekê' û Cemil Denli 'Azmûn', diisa jî ev hejmar bi ber şepa gelek kêm a siyê n teknîk û hindek nivîsên ne li cih ketiye.

Her wekî tê zanîn pîrbûna rûpelan û sernavên mezin ê nivîsan navero-ka kovarê xurt nakin.

Bo nimûne sernavê nivîsîna Hesen Zinar gelekî mezin e. Digel ku nivîsa nivîskarê navbirî çêj û eleseke xwe ya taybetî heye jî, lê naveroka nivîsê digel sernavê xwe hiç negonçaye.

Ji layekî ditir ve, weşandina helbestên werger, digel ku rewşeke gerdûnî nade mirovî jî, (îro) ne ji mîsyona Jiyana Rewşen e. Çimkî, temet ku em dizanin, ev kovar ji layê saziyê kurdî ve bi mîsyon û armanca danasîna jiyana û kelepore kurdewarî tê weşandin.

Di encamê de, gava ku em rewş û kawdanên xwe yên neteweyî berçav dikin, wekî vê hejmara pêncemîn, berdevamkirina hejmarên ditir xwerû bi zimanê kurdî, di baweriyê min de bêhtir û çêtir li bejn û bala jiyana Rewşen tê.



## Ji ber min ve silavli zarokên Licê

DILBIXWÎN DARÀ



Ji ber min ve silavan ji zarokên Licê re bişînin. Destên wan biguvişin û çavên wan ramûsin.

Milê xwe bidin milê wan û di bin piyên xwe de dagirkeriyê bihejînin.

Ji ber min ve vê nameyê ji zarokên Licê re bixwînin.

Ew zarokên ku di zikên diyên xwe de nav li xwe kirin 'qehreman'.

Ew zarokên ku di çavên wan de kîna her salekê dibe bombeyek û di dilê wan de her hêviyek dibe guleyek ji bo serxwebûnê.

Ez çi bibêjim..?

Ji ber min ve, navekî li zarokên Licê

bikin.

Ew zarokên ku hîna nehatine naskirin, yên ku nizanin serê xwe bitewînin û nikarin di bin bêrûmetiyê de bêdeng bimînin.

Zarokên Licê, bejna wan kin, destên wan dirêj.

Ew hem ji bo îro, hem jî ji bo sibê... Ne tenê îro û sibê... Ew ji bo hemû dirokê, nimûneyên parastina rûmeta mirovahiyê ne.

"Bila ew bibin ceşş... Emê pereyan bidin wan. Kurd nabin ceşş, kurd welatparêz in..!"

Yên ku van gotinan dibêjin zarokên Licê ne. Belê, zarokên Licê ne... Mirov nebihîze û nebîne bawer nake, lê belê zarokên me ne yên ku xwe diavêjin pêşiya kamerayan, bi tiliyên xwe nişana serkevtinê bilind dikin û bi baweriyê mezînan diqirin:

"Em xwediyê Licê ne. Em xwediyê wî welatî ne, em nahêlin bavê me çeka ceşşîtiyê hilgire."

Dema ku mirov çavên wan, nebîne û li kurdiya wan guhdarî neke, wê bibêje, ew ji Nablus, an jî ji Gazayê diaxivin.

Na... Na... Ew zarokên me ne. Licê ne.

Çavên min hinek caran li hinek zarokên me yên li Ewrûpayê dikeve, hey waxx ji bo parçeyek şokalata (çîkolata) dikarin hefteyekê bigirînin.

Lê hema zarokên Licê, ji bo parastina parçeyek kevir ji axa welatên xwe dikarin bi hefteyan birçî bimînin. Ev in, zarokên Licê.

Ji ber min ve dilê xwe ji zarokên Licê re vekin û ji wan re hezkirina min a bêşnor bibêjin. Dilê min ji wan re vekin û bila cihê xwe bibînin.

Çiqas bi temenê xwe, bi bejn û bala xwe, bi dev û lêvên xwe, bi enî û çena xwe nazik û delal bin jî, lê belê ew ji bo mezînan cesaret û ruhekî berxwedanê ne.

De werin em bi hev re silavan ji Zarokên Licê re bişînin...

# Eşheda xwe bîne

**K**urd û ermenî, ji berê ve di nav hev de jiyane. Keç û xortên xwe bi hev re zewicandine. Ji hêla aborî û civakî ve jî tşkiliyê xwe bi pêş xistine. Dewleta osmanî her tim li hemberî van tşkiliyan, helwesteke ne baş nişan daye.

Rojekê paşa gazî qazî û nazirên xwe dike û dibêje:

- Fetwayekê derxînin kurd û ermenyan berî hev û din bidin.

Qazî û nazir digihin hev û fetwayekê derdixînin: "Kî yekî ermen bikuje, ew diçe bihuştê."

Miftiyê navçeyekê, rojekê diçe gundekî wê fetwayê radigihîne gundiyan û dibêje:

- Hûnê vê fermanê pêk binin.

Rojekê gundiyeke kurd, yekî bi eslê xwe ermenî li navenda gund dibîne û xencera xwe ji kelan dikişîne û bi ser de diçe, dibêje:

- Eşheda xwe bîne ezê te bikujim.

Yê ermen:

- Eman yeman çi bû, çi qewimî, çi stîrî, ji bo çi tu min dikujî? Yê kurd:

- Weleh bileh tileh ezê te bikujim.

Ger tu eşheda xwe bînî, ezê te azad bikim. Ger tu eşheda xwe neyinî weleh tu çûyî.

Yê ermen dinêre ku yê kurd bi rastî



wê wî bikuje, çareyekê nabîne û direve. Dema direve yê kurd dide pey. Bi qasî qederekê diçin ê ermênî diweste û yê kurd wî digire û diavêje erdê, li ser singê wî rûdine û jê re dibêje:

- Eşheda xwe bîne bibe misilman.

Ermen:

- Kirîv weleh ez nizanîm. Ka ez çi bibêjim. Dev ji min berde ez li ser dînê xwe, tu li ser dînê xwe, çi xisara me gihiştîye hev.

Yê kurd:

- Na weleh îmkana wî tune îlah tê

eşheda xwe bînî.

Dema yê ermen dinêre yê kurd bi biryar e.

Wiha dibêje:

- De ka ezê çi bibêjim, tu bibêje ez jî dubare bikim.

Yê kurdî şaş dimîne, wê çi bêje.

Dibêje:

- Weleh ez jî nizanîm mirov bi çi awayî eşheda xwe tine.

Yê ermenî dibêje:

"Ew çax tu ji xwe re, ez ji xwe re."  
A. BAKI ÖZBOĞANLI

## Doşava bêtehm

Dewleta osmaniyan bi sîstema eyaletî dihate birêvebirin. Navê eyaletekê jî Kale-î Beyazîd (Doğubeyazîd) e.

Gelê wir hemû kurd in. Gundî jî pir li paş mabûn. Çavgirtî bûn. Her gundiyeke çend salan carekê dihate bajêr û bajariyan jî pir qerf û tinaz bi wan dikirin.

Rojekê yekî gundî yanê kurmanc diçe bajêr, birçî dibe.

Diçe firinekê ji xwe re nanekî distîne û li pey xwarinê digere. Bala xwe didê ku yekî soldirî (koşker) solan pîne dike, li rex wî jî tasek heye, di tasê de jî avê ka zer heye. (Soldirî ji bo ku çermê sola a bi rihetî bidirû, dixê avê ji ber wê ji ava di tasê de zer bûye)

Gundî ku wê avê dibîne, ji xwe re dibêje ku ezê nanê xwe bi vê doşavê re bixwim.


Diçe cem soldirî, silav didê û dibêje: "Ez dixwazim tu vê doşavê (dîms) biruştî min û ez pê nanê xwe bixwim."

Bajarî dinêre ku ev gundiyeke nezanê. Dibêje: "Belê." Bazara xwe dikişî û gundî tasê dide ber xwe. Nanê xwe hûrî tasê dike û doşavê, wê ava qirêjî dixwe; pişt re devê xwe paqij dike, ji Xwedê re şikir dike û dest diavêje berîka xwe, peryên xwediyê doşavê didê û jê re dibêje.

"Ne bêje kurmanc î bêfême e. Doşava te yî bêtehm e."

## BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (55) XAÇEPIRSA

B	B	E	A	B						
H	E	S	E	N	H	I	S	Y	A	R
R	A	S	E	R	T	J	O			
S	O	R	M	L	T	A	N			
K	C	I	M	A	T	R	A			
P	Z	A	R	A	E	R	K			
P	A	L	N	A	R					
G	E	M	A	R	M	E				
N	A	K	O	T	I	N				
Y	A	R	A	R	A	R				



PEYVA VEŞARÎ

### Bersiva Xaçepirsa 53'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 55'an pirtûka **MAYAKOVSKI** (ŞÎRÊN BIJARTE) ye


**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê-nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 53'an, pirtûka .... "Özlem Güllü Surti" qezenc kirine: **Mehmet Orak/ Manisa, Ahmet Yılmaz/ Bazîd, Dağustan Öztürk/ Amed, Yılmaz Melek/ Stenbol, Mehmet Can/ Qers**

Kolej	Meheke biharê	Eşîreke çermSORAN Xwarina hewyanan	Gewmê Hz. Muhemed Cejîn	Nebatek Rejîsorekî Japonî	Kesê Ji Iranê
Şêx... (Wêne)					
1				6	
Alet	Hazîrkar Bajarekî Kurdistanê				
		Kevnar	Disa, cardîn	4	
			Dezi, Ben		
Agir	3	Hece, movik	7	Vekrî, rewşen	5
Sureyêke Quranê		Derbebder		Giloverî bi erebî	
			Karê adanê		
			Niha		
Ê li ber garanê			Argon		
Notayek			Nêçîr		
	Neteweke cîran				
	Qertafek				
Alikar					
Uranyûm					
	Raweya neyinî ya ketinê	2			

PEYVA VEŞARÎ





## 'Her dinya li hev dikeve, mezlûm nêzî armancên xwe dibin'

Têkbirin û êrîşa Rojava ji zemanê Îskender ve ye, li hemberî wê, me jî êrîş dibir ser Rojava. Eceman ew êrîş kirin. Pişt re Îskender hat. Rûm hatin, Hanîbal şerê wan kir. Pişt re Zenubya, dawî Omer kurê Xettab. Mislîmanan êrîş birin ser Îspanyayê, Îtalya û Fransayê. Selbî hatin êrîşî me kirin. Osmanîyan jî êrîşê Rojava kir. Pişt re Îngiliz û fransîz hatin Rojhilat û niha jî amerîkî.

Destpêk Rûpel 8-9

Ji bo ku ne rewşenbîr serencama (çarenûsa) mirovan datînin. Tiştê ku hilweşiya komunîzma Rojava bû, nimûne ya ewrûpî ya ku li ser bingeha milkê taybet ava bû, ew hilweşiya. Rojava jêdereke (çavkaniyê) ne baş e ji komûnîzmê re. Erê hilweşandin para tecrûbeya Çînê bû jî, ew tecrûbe bêhtir serkeftî bû û xwe bi cih kiribû. Ji ber ku ew tecrûbeyê xweserî Çînê bû, ne ji Rojava hatibû. Hilweşîna vê tecrûbeyê ne ji sedemê hundirîn bû, lê ji ber ku rejîma wê ya siyasî ji ya Sovyet hatibû girtin.

Eger Çîn di rejîma xwe ya siyasî de, li pey şopa filozofên xwe yê tawî û mûhî (du mezhebên felsefeyê li Çînê) meşiyabûya, wê rejîma xwe ya komûnîst biparasta.

Împeryalistên Rojava bi serokatîya amerîkan, xwedî roleke mezin bûn di hilweşandina Çînê de. Wan çendek ji siyasetvanên ku bi çanda Rojavayê perwerde bûne kirin destîkê kera xwe û Çîn quto quto kirin.

Eger ne ew ajan û sîxur bûna, împeryalistan nedikarin tiştik bikirina.

Were em dev ji alemê berdîn û di vê herêma xwe de bifikirin. Divê em kar bikin di hundirê sînorekî ji enternasyonalîsteke Rojhilatê Asyewî û dev ji xeyalên civaka navneteweyî berdîn. Ev civak çêkirina Rojava ye û em û wan tu carî nabin yek.

Yekbûna alemê jî xefkeke (toreke) împeryalist e, gelek ji netewekar û çepgirî ketinê û ehmeqiyên bêjimar kirin. Nakokî û kêşa neteweyî û qatî (tebeqî) durûşma herêma me ye û ev nakokî wê dawiyê xuya bike.

Ev bersiva we me digihîne pîrseke di: Gelo di nêrîna we de şêwe û uslûba munasibtir ji hevjiyanê aram re di nav mîletên Rojhilata Navîn de çi ye?

Were em bi nav bikin: Mîlatên Rojhilata Navîn ereb, kurd, tirk û faris in û niha ev mî-

let di nakokiyê ku împeryalizm wê gur dike de, dijîn. Ev jî berpirsiya mîletan bi xwe ye; ereb, tirk, faris, tevde mîletê kurd diazîrînin û welatê wan îşgal kirine. Gel bi xwe jî beşdarî zilmê dibin, ne tenê hukûmet. Mîletê ereb, mîletê tirk, mîletê faris, qebûl dikin dagirkirina (îşgelkirina) Kurdistanê û lê nanihêrin wekî îklîmeke cihêreng û qabilî cudabûnê.

Ereb kurdan dikin ereb, tirk wan dikin tirk û faris wan dikin faris. Heta yê ku piştgiriya doza kurdî dikin di nav van mîletan de, hê nanihêrin wekî doza mîletê parçebûyî û ji welatê xwe mehrûn. Lê ew li vê dozê dinihêrin wekî doza kêmayiyê etnî (qewmî) û piştgiriya wê dikin di nav sînoren dewletên xwe de.

Tirk jî hin parçe ji xaka erebî îşgal dikin û dixwazin çemên Dîcle û Feratê qut bikin da ku Iraqê bikin çol. Faris jî keviya rojhilat ji Şetulerêb îşgal dikin û dixwazin sînore xwe li ser hesabê Iraqê fireh bikin. Bi vî rengî nakokî li herêma, di nav gelan bi xwe de ye. Tu hevî jî nîn in ji hevjiyanê aram ne di nav van gelan de. Eger her gelek çilekiya (timehiya) welatê di ber nede, divê mafê kurdan di serxwebûnê de were parastin û îran çavê xwe ji Iraqê û axa wê vegevine. Projeyên tirkan di her du çeman de werin rawestandin û tirk erdê ereban lê vegevine.

Dewleta kurdî xewna milyonan e ji gelê kurd. Ev xewna tim tê kuştin, her ku kurd bi cidîyet dixwazin dewleteke serbixwe çêkin. Wekî mirov tê digihîje di xwendina dîrokê û rewşa îro de fobiyê heye. Fobiyê giştî ji vê pîrsê, çi li Rojava û çi li cem dagirkerên Kurdistanê, gelo jêderka vê fobiyê (vê tîrsê) çi ye û wê mîletên vê herêma çi ziyar bikin dema ku dewleteke kurdî çêbe? Ev dewleta ku wê aramiyê û aştiyê mezin li herêma çêke, piştî ku doza kurdî ji meydana listîkên navneteweyî derkeve, ev doza ku bûye kaxi-

zek di dastê her kêzî de û pê nerihetî û ne aramiyan peyda dikin.

Erê, ew tîrsa ji kurdan e, nexweşiyek e di Rojava tevde ji bilî çend îstîsnayan û nexweşiyek e di nav ereb û tirk û eceman tev de. Ji bilî hinek îstîsnayan, tevan dewleta Îsrailê ya ku ne li ser xaka cihûyan qebûl kirin, lê bi wan zor e ku dewleta Kurdistanê qebûl bikin. Ev dewleta ku wê li ser xaka kurdan çêbe, mîletê kevînar e, berî her mîletê vê herêma li welatê xwê bi cih bûne. Mafê wan tune ku welatekî çêkin?

Rojnameyê wekî Rêgay Kurdistan behsa mafê cihûyan di welatekî de dike, tu dibêjî qey ev wezîfeya wê ye wekî rojnameyê kurdî. Ev jî, ji tesîra fikra rojavayî ye ya di hişê rewşenbîr û siyasetmedarên me de bi çepgir û rastgirên wan.

Tu ravekirin (îzahkirin) ji vê tîrsê re li ba min nîn e, tevî ku kurdan berê, çend dewletên serkeftî saz kirine li ser axa Kurdistanê di dirêjahiya serdema îslamî de û ji wan mezinîrîn serokê îslamî piştî Muhemed û eshabeyên wî peyda bû, ew jî Selahadîn e, yê ku bi eslê xwe wekî Ibn Kesîr dibêje ji malbatên kurd ên herî bi şan û şeref e. Dewleta kurdî divê saz bike û durûşma min a ku ez her dem bilind dikim ev e: Bila dewleta Îsrailê biçe û dewleta Kurdistanê were û ne xema min e ku erebên qewmî ji min bixeyidin. Çi ku ev gotina narewa wan dilerizîne, diricifîne, lê bêxem bi dewleta Îsrail a talanker re didin û distînin.

Sazbûna dewleta kurdî mafekî mutlaq e û ev gotina te ya "Wê ev dewlet aramiyê û aştiyê mezin li herêma çêbike" jî, ji tesîra wergerandinê ye. Tu ey birayê kurd, bi zimankê navneteweyî diaxivî. Aramî ihtiyaca hêzên serdest e, ji ber ku rewşê wekî xwe di hêle. Lê komûnîstên Çînê ev durûşm bilind kirin: Tevliheviyê cihan wergirtiye û rewş dikele. Her ku dinya li hev bikeve, kesên mezlûm nêzîkî armancên xwe dibin, lê ku aramî çêbe wê zilm bidome. Dewleta Kurdistan divê lihevketinekê li dijî aramiya împeryalist çêbike. Û ez bi te re me ku divê doza kurdî ji meydana listîkên navneteweyî derkeve û tekeve destên xwediyê xwe. Ev jî tê wê wateyê ku "mîrên şer" kar bikin û netewekarên bi şeref dozê têxin destê xwe.

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖZLER

NÂVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimîndeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:

M. Rojava  
Suriye: Jan Dost  
Helîm Yûsiv

Berlin:  
Silêman Sîdo  
49-30-69002695

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

# Em riya çapemeniya kurd dişopînin



'Em li dijî sîstemê dixwazin ku gel muxalefeta rastîn bimeşîne. Her wiha em xebatkarên sosyalîst in, ji ber vê yekê jî, em dixwazin ku demokrasî ji her awayî ve were sazîkirin. Ji aliyê çapemeniyê ve jî, em çapemeniya kurd a piştî salên 90'î ji xwe re rêber û rêzan dibînin. Ango em riya Özgür Ülke, Özgür Gündem û Yeni Politikayê dişopînin.'

Rojnameya Güney Uyanış li Herêma Çukurovayê bi awayekî kolektîf û bi tarzeke şoreşgerî weşanê dike. Rojname ji 15 rojan carekê derikeve pêşberî xwendevanên xwe. Tiraja rojnameyê ve gavê nêzikê 1500'î ye. Güney Uyanış li Edeneyê tê çapîkirin, ji ber vê yekê di resmîyetê de Edene navend tê hesibandin. Li hêla din, li Mersîn, Hatay û Îskenderûnê jî buroyên rojnameyê di faliyetê de ne. Vê gavê xebatkarên rojnameyê, ji 10 kesî pêk tê. Berpirsa Rojnameyê Filiz Çay diyar dike ku ew 1500 abone û xwendevanên xwe ji bo xwe mîna xebatkar û "muxabîrên xwezayî" dibînin.

Güney Uyanış, di gelawêja 1994'an de dest bi weşanê kiriye. Ji wê rojê heta îro pest û kotekiyên dewletê li ser xebatkarên rojnameyê kêmtir nebûne. Heta vê gavê weşan bi dehan car ji aliyê dadgehê ve hatiye sekandin. Belavkarên wan hatine binçavîkirin, hejmara 10'an bi awayekî kêfî bêtir biryara dadgehê ji hêla Emniyeta Hatayê ve hatiye desteserîkirin. Xebatkarên rojnameyê gîşî erêb in. Ji ber ku Hatay, Îskenderûn û Edene mîna "mozaîka gelan" in. Wan jî pêwîstiya derxistina rojnameyê bi vî rengî dîtine. Li herêmê di nav demokrat û sosyalîstan de her çiqas rojname mîna "Dengê erêban" were binavîkirin jî, Filiz Çay li hemberî wê gotinê derdikeve û wiha dibêje: "Belê em

erêb in, em bi gîştî xîtabî erêban bikin jî, lê belê em xwe wekî dengê hemû gelên bindest ên herêmê dibînin. Ji ber ku em mafên gelên bindest bi awayekî şoreşgerî û sosyalîst tînine ziman, ji ber wê jî her tim em dibin hedefa êrişên dewletê."

Filiz Çay, der barê astengiyên weşanê, çapemeniya dijber û pirsîgirêka kurd de pirsên me bersivandin.

\*\*\*

*Bi kurtî hûn dikarin xeta weşana xwe, bidin xuyakirin?*

– Bi gîştî li Tirkiyeyê û li Kurdistanê, bi taybetî jî li herêma Çukurovayê, ji bo ku mozaîka gelan derkeve ronyê, ji bo dîrok û çand, ji bo mafên kedkaran, ji bo demokrasî, aşî û

azadiyê em weşaneke polîtîk di-meşînin. Bi kurtahtî ji bo jiyaneke birûmet em hewl didin xwe

*Di weşana xwe de hûn mesajên çawa didin gel û di ragihandina mesajan de pirsîgirêkên çawa derdikevin pêşberî we?*

– Mesaja me ya bingehîn li herêmê "bihevrebûna gelan e." Em dixwazin li Çukurovayê gelên ku roj bi roj asîmîle dibin, bînin cem hev, ta ku rê li ber wê asîmîlasyonê bê girtin. Em her tim di-

bêjin gelên cihanê bi çanda xwe tînanaskirin. Jiholêrakina gelan, tunekirina çandên gelan, êdî bes e. Ji bo çî bi salan e, navên gund û bajarên kurdan tîne qedexekirin, guhartin? Armanç; tunekirina tevahiya gelê kurd e.

Ji vê yekê erêb, laz, çerkez, abaza û gurciyan jî nesîbên xwe standine. Îro li Tirkiyeyê dîn, çand, ziman, al, dîrok û netewe dibin baskê dewletê de ne. Dewlet dibêje. "Yek dîn, yek zîman, yek beyreq û yek netewe." Kesên li dijî wê gotinê

derdikevin, dewlet bi her cureyî zordariyê li me dike. Li dijî van yekan derdikevin, dewlet bi her cureyî zordariyê li me dike. Li dijî van astengiyên em xwe baş nagihînin gelê xwe. Ji weşanê bigire heta belavîkirinê, serê me bi dewletê re di belayê de ye. Cara dawî li esnafên ku em rojname didine wan yekê, yekê geriyane û ji bo ku rojnameyê careke din nestînin ew tehdîtî kirine.

*Hûn çihê xwe li ku dera çapemeniya dijber dibînin?*

– Beriya her tiştî em xwe li cem çapemeniya şoreşger û welatparêz dibînin. Em li dijî sîstemê dixwazin ku gel muxalefeta rastîn bimeşîne. Her wiha em xebatkarên sosyalîst in, ji ber vê ye-

kê jî, em dixwazin ku demokrasî ji her awayî ve were sazîkirin. Ji aliyê çapemeniyê ve jî, em çapemeniya kurd a piştî salên 90'î ji xwe re rêber û rêzan dibînin. Ango em riya Özgür Ülke, Özgür Gündem û Yeni Politikayê dişopînin.

*Rojnameya Güney Uyanış bi perspektîfêke çawa li pirsîgirêka kurdî dîtinê?*

– Em dibêjin mafê gelê kurd heye ku qedera xwe bi îradeya xwe tayîn bike. Bi vî awayî jî em têkoşîna gelê kurd, têkoşîneke pîroz û mafdar dibînin. Her çiqas bi awayekî herêmî em weşana xwe bikin jî, em ji rojeva Tirkiyeyê û Kurdistanê jî ne dûr in. Rojeva serê çî ye? Pirsîgirêka kurd e! Ji ber vê yekê em her dem îhlalkirina mafên mirovan li Kurdistanê di weşanên xwe de tînin ziman. Em têkoşîna gelê kurd a li hemberî kedxwarî û bîrûmetiyê silavî dikin.

*Tiştê ku me ne pirsîbe hûn bibêjin heye?*

– Belê, Sohbetêkê bi vî rengî û nasandina rojnameya me di rojnameyêke kurd û bi zîmanê kurdî em gelekî dîlşadî kirin. Her wiha tevî ku zîmanê me çihê ye, dil û fikrên me yek in. Di dawiyê de jî ez dixwazim dirûşmeya ku gelê kurd tîne zîman, bi zîmanê xwe bibêjin: "Yeaşa Şeabîl exwanî (Bijî biratiya gelan)"

SALIHÊ KEVIRBIRÎ